# JINEOLOJÎ

ERK Û REHENDÊN JINEOLOJIYÊ

# AMADEYÎ

3

2020 /2021

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Jineolojiyê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya JINEOLOJÎ**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê.**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, weke pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


**BEŞA 1 ................................................ 7**

PÊVAJOYA SOSYALÎZMÊ ........................................ 8

ROLA JINÊ DI ŞOREŞÊN EMERÎKAYA LATÎN DE ........................ 13

ROLA JINÊ LI BAŞÛRÊ EFRÎKAYÊ ................................ 17

LÊGERÎNA AZADIYÊ YA HAY GÎN................................ 19

(JINA ERMENÎ)................................................ 19

JINÊN KURDISTANÎ -1 ........................................ 24

JINÊN KURDISTANÎ - 2 ........................................ 28

**BEŞA 2 ................................................ 37**

RASTAVAKIRINA HEVJIYANA AZAD ................................ 38

HEVJIYANA AZAD 2 ............................................ 44

AVAKIRINA RONAKBÛNA JINÊ .................................... 51

ŞOREŞA DI ZANISTÊN CIVAKÎ DE ................................ 55

PÊŞXISTINA RÊBAZA LÊKOLÎNEKE LI GORÎ RASTIYA JINÊ ............ 58

BIGIHÎNIN SERFIRAZIYÊ ...................................... 63

GIRÎNGIYA PARASTINA CEWHERÎ JI BO JINÊ ........................ 69

JIN, TA DAWIYÊ HEYÎNEKE NIRXDAR E ............................ 73

**BEŞA 3 ................................................ 79**

ETÎK Û ESTETÎK .............................................. 80

ABORÎ ........................................................ 87

DEMOGRAFYA .................................................. 92

EKOLOJÎ ...................................................... 97

DÎROK ........................................................ 101

TENDURISTÎ .................................................. 105

PERWERDE .................................................... 110

POLÎTÎKA .................................................... 115

**BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ .................... 121**

# BEŞA 1

## JIN DI ŞOREŞÊN SOSYALÎST Û TÊKOŞÎNÊN RIZGARIYA NETEWÎ DE

1. Pêvajoya sosyalîzmê
2. Rola jinê di şorşên Amerîkaya Latînî de
3. Lêgerîna azadiyê ya Hay Gîn
4. Jinên Kurdistanî (1)
5. Jinên Kurdistanî (2)

WANE 1

# PÊVAJOYA SOSYALÎZMÊ



Sosyalîzim, di dawiya sedsala 19′an û destpêka sedsala 20′an de, li hemû cîhanê bi liv û tevger bû. Pir gelan li dijî imperatoriyan, şerên serxwebûnê li dar xistin. Bi vê yekê, sedsala sosyalîzmê, dest pê kir.

Di wê demê de, rola jinê pir girîng bû, herwiha di hemû şoreşan de, bû hêza herî çalak a qehremanên têkoşîna serxwebûn, azadî û sosyalîzmê. Di vir de taybetiyên hebûn û nasnameya jinê, yên ku bi hezarên salan hatibûn çewisandin û bindestkirin, eşkere bûn. Jin bû pêşenga civakê û careke din baweriya xwe bi xwe anî. Lê bi nêzîkatiyên şaş û çewisandinên zordestiya zilam ên rêhevalên xwe re, ku di heman eniyê de, şer dikirin jî rû bi rû man.

Dema ku şoreş qediya û ji bo ku jin careke din vegere jiyana xwe ya asayî, ango jintiya malê, li hember kevneşopî û çewisandinên ku wê neçar hiştin, rû bi rû ma. Ev serbûrî, li gorî mercên xweser ên welatan, di ast û şêweyên cur bi cur de, pêk hatin.

Azadbûn û pêşveçûna jinê ên ku ji rastiya welat û civaka wê serbixwe be, ne gengaz e. Em dikarin vê pêvajoyê bi aliyên wê yên erênî û neyînî, ku ji bo jinan guhertinên bingehîn bi xwe re anîne, ji erdnîgariyên cur bi cur ve, nas bikin.

## ROLA JINÊ DI ŞOREŞA SOVYETÊ DE



Rosa Luxemburg

Rosa Luxemburg (Roza Luksembûrg) ku milîtarîzm û emperyalîzma Alman bi tundî rexne dikir. Di sala 1905’an de, tevlî Şoreşa Rûsî a Yekem dibe. Ji ber sedema kar û xebatên derzagonî, di 4’ê Rêbendana 1906’an de hat girtin. Piştî ku Rosa tê dersînorkirin û

vedigere Almanyayê, têkoşîna xwe ya bîrdozî ya di partiya xwe de didomîne. Di sala 1912'an de weke nûnera SPD'yê (Partiya Demokratî a Civaka Almanî), li paytextên cur bi cur ên Ewrûpayê beşdarî kongreyên sosyalîst ên ku tên lidarxistin, dibe.

Almanya, di 1'ê Gelawêja 1914'an de li hemberî Fransa û Rûsyayê şer radigihand. Di 5'ê Gelawêjê de, bi 6 hevalên xwe re ku Clara Zetkin û Franz Mehrig jî di nav de bûn, "Koma Enternasyonal" ava dike.

Ev kom, piştî du salan vediguhere "Koma Spartakus." Rosa, di 18'yê Reşemeha 1915'an de dikeve girtîgehê. Dema ku Rosa, di 9'ê Mijdara 1918'an de tê berdan, Şoreşa Mijdarê dest pê dike. Bi derketina Roza re, ya ku di asta sazîbûyî de parêzvaniya mafê gelên mêtîngeh û civaka ne kapîtalîst dikir; şoreşên azadiyê yên wê sedsalê, şêwe û teşeyên nû wergirtin.

**Vera Zasuliç (Vîra zasolîtiş),** di nava şoreşgerên Rûsî de, yek ji kesayetên şoreşger ên herî dildar in. Ji ber çalakiyên reşkujiyê yên li hemberî Çar û generalekî, tê darizandin û mişextkirin. Piştî vegera ji mişextiyê, tevahî jiyana xwe dide amadekirina şert û mercên şoreşê. Marx (Marks), Engels (Ingêls), Lenin (Lênîn) û Troçki (Troçki), tenê çend navên ku di nava pêywendiya nêz de ne. Lenin, dema ku li Munihê bû û bi Verayê re pir caran hevdîtin pêk aniye, heyranî vê jina rewşenbîr a derasayî dibe. Dema ku Partiya Karkeran a Sosyal a Demokrat a Rûsyayê dibe du beş, piştgiriya Menşevîkan dike. Ji ber vê sedemê, ji aliyê Lenin ve tesfiyekar tê ragihandin.



Vera Zasuliç

Alexandra Kolontay (Eliksandira Kolontay), grev û meşa karkerên jin a li Petrogradê ya di 8'ê Avdara 1917'an de bû çirûska destpêka Şoreşa Reşemehê ya ku dawiya desthilatdariya Çar, anî. Di lêgera şoreşa civakî û guhertina jiyanan de rista jinê hebû.



Alexandra Kolontay

## ROLA JINÊ DI ŞOREŞA ÇÎNÊ DE

Li Çînê, kevneşopiyên ku çavkaniya xwe ji teşegirtina baviksalariyê digirtin, bi misogerî hemû jin di bin çewisandinê de radigirtin. Yekem tevgerên jinan ên ku li Çînê bi pêş dikevin, piranî ji aliyê jinên çîna jor ve tên piştgirîkirin her wiha tevgerên girêdayî tevgerên netewî jî bi pêş ketine. Partiya Komînîst a Çînê ya ku pêşengiya têkoşîna netewî dike û tevgerên jinan, weke pêvajoyeke ku ji guhertina civakê nayê qutkirin, pênase dike. Pîvana Marksîst a ku dibêje: rizgariya jinê, tenê dikare bi tevlîbûna wê ya hilberîna civakî re pêk were, diecibîne.

Dibêje: "Dema ku Partiya Komînîst a Çînê bibe desthilat, dê jin di hilberîn, xebatên ramyarî û bibirêveberiyê de erkan werbigirin. Ger ji têkoşeriya şoreşa Çînê re tevlîbûnên jinan çêbûbin jî, nabin xwediyê risteke çalak. Di şer de ji bo ku karibin ristên xwe yên çalak bilîzin, divê bikevin dilqê zilaman." Mînaka vê ya balkêş, jina bi navê Kao Çon-Çinge.

Li her devera welat, rêxistinên jinan ên ku bi demê re vediguherin federasyon, tên avakirin. Bi federasyonan re giranî ji ronahîkirina jinan û nêzîkatiyên ku baweriya cewherî bi pêş dixin re, tê dayîn. Di şoreşa çandî de, ya guhertin û veguhertinek bingehîn a civakî armanc dike, jin ristên çalak werdigirin. Ji ber ku di nêzîkatiya pirsgirêka jinê de ji aliyê teorî û pratîkî ve xetek rast nayê girtin, veguherîna civakê lewaz dimîne.

Berjewendiyên şoreşê, weke sedem tên nîşandan, pirsgirêk û rêxistina jinê di plana duyem de tên hiştin. Bi ramana serdestiya zilam ve gihaştina lihevkirinê çêdibe. Jin, di navbera berjewendiyên jinan û şoreşa sosyalîst de nikarin pêşengtiyên xwe diyar bikin. Salên piştî wê, Partiya Nijadperest dibe desthilat. Li hemberî nêzîkatî û pêkanînên zordest ên vê partiyê, herî zêde jin têdikoşin. Di vê demê de, gelek jinên ku ji bo pergala demokratîk çûne çalakiyan, ji aliyê parlemenê ve rastî pêkanînên giran hatine û hatine darvekirin.

## ROLA JINÊ DI ŞOREŞA VIYETNAMÊ DE

Jinên Viyetnamî, di pêşengiya Partiya Kedkar a Viyetnamê de, bi rengekî çalak beşdarî têkoşîna şoreşgerî dibin. Jin, bi rêbazên veşartî dixwazin bigihêjin her qadên têkoşînê. Bi taybetî, bi xebatên bangeşeyê dixwazin gel birêxistin bikin.


Le Thi Rieng

Di pêvajoya van xebatan de, jinên ku tên girtin, di îşkenceyên cur bi cur re tên derbaskirin û kuştin. Jineke bi navê Le Thi Rieng (Lûsî Rînîc), di pêvajoya berxwedêriya zindana Saigon (Saygonê) de bi berxwedaniya xwe ya ku bi qehramanî kiriye, dibe sembola jinên Viyetnamî. Wekî din jî, Viyetnam ji ber ku bûye du parçe (Bakur û Başûr), cudahiyên her parçeyê û awayên tevlîbûnên jinan a ji têkoşînê û rêxistinên wan re jî bandor dike. Mînak: Jinên tevlî şerê gerîla yên Bakurê Viyetnamê bûne, zêdetir xebatên pişt eniyê meşandine.



Li Başûrê Viyetnamê jî, ji ber ku her devera welat vediguhere qada şer, jinan bi awayê çalaktir û di ristên girîng de cih girtine. Li hin cihan jî erkên weke fermandariyên kelehê wergirtine.

Piştî Têkoşîna Rizgariya Neteweyî tê biserxistin û şûn ve Yekîtiya Jinên Viyetnamî diyar dike ku şoreşa jinan hîna temam nebûye. Ji bo ku jin pirsgirêka xwe ya nasnameyê çareser bikin, bi vîna xwe beşdarî qada ramyarî bibin û di malbatê de asta hevjîniyê bidin rûniştandin, têkoşînê didomînin.

Di encama vê têkoşînê de, pênc destûrnameyên wekhev, di sala 1960'î de tên derxistin. Ev destûrên ku jin di şer, ked, birêveberiya partiyê û rêvebirina civakê de bi tevlîbûneke wekhev cih bigirin, bingeh digirin. Lê ev sererastkirinên dadî yên hatine kirin, di rewşa kevneşopiya civakî ya jinê de guhertinên bingehîn çênakin. Di pirsgirêka jinê de pêşveçûneke rêxistinî û pratîkî nade afirandin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Ji aliyê kê ve, yekem tevgera jinên Çînê, pêş dikeve?
2. Komînîst, çawa tevgerên jinan pênase dike?
3. Rista Le Thi Reng a di Şoreşa Viyetnamê de çi ye?
4. Şoreşa Viyetnamê ya Bakur û Başûr, binirxîne.

WANE 2

# ROLA JINÊ DI ŞOREŞÊN EMERÎKAYA LATÎN DE

Jin, di welatên Emerîkaya Latîn de, di têkoşîna serxwebûnê de, li hemberî mêtingeriyê, û dîktatoriya milîtarîst a ku di nava welat de dest danîbû ser birêveberiyê, bi awayê çalak li ber xwe didin. Jinên Kubayî, li hemberî mêtingeriya Îspanyayê û koletiyê, tevlî refên têkoşînê dibin.

Di nava rêxistinên serbixwe yên di sala 1860'î de, jina bi navê Anna Bertcancourt, yek ji wan pêşkêşên ku tevlî civînekê dibe, û daxwaza mafên wekheviyê dike. Li welatên Emerîkaya Latîn, di pêvajoya duyem a sedsala 20'an de beşeke wê ya herî mezin, di bin rejîmên leşkerî de (Guetamala, El Salvador, Nîkaragua, Bolîvya, Ekvator, Şîlî, Uruguay, Paraguay û Arjantîn...) derbas dibin. Lê belê ji aliyê din ve, li hemberî van dagirkeriyan jî têkoşînên gerîla yên ku hatine meşandine, mohra xwe li dîroka dema nêzîk a gelek welatên parzemînê dixe.

Berxwedanên destpêkê yên ku li hemberî binpêkirina mafên mirovan ên birêveberiyên cuntayên faşîst hatine lidarxistin, ji aliyê eniya jinan ve, pêş ketine. Berxwedêriya ku li hemberî rejîma leşkerî ya di sala 1970'yî de jinên karkerên kanza yên Bolîvyayî, Dayîkên Şîliyî ku li hemberî Augusto Pinochet (serdestê dictator yê Şîlayê) li ber xwe didin, têkoşerên ku tê xwestin werin girtin, bi saya rêxistinên binerd ên jinên Guatemalayî ve rizgar dibin.

Di salên 1990'î de, bi jiholêrakirina van rejîmên dîktator re, hin jinên ku di nava wan rêxistinên kevn ên gerîla de cih girtine, tevlî jiyana ramyarî dibin û di têkoşîna azadkirina jinan de ristên pir girîng dilîzin.

Li Emerîkaya Latîn, li dijî pêkanînên dîktatoriyên faşîst ên ku civakê xerab û cavtirsandî dikin di serî de jinên Arjantînî,

Guetemalayî û Şîliyî bi şerekî rêxistinkirî, bersiv dane. Jinên ku xizmên xwe winda kirine, hatine gel hev û li hemberî dîktatoriyê bi protestoyên vekirî û serhildanan, çalakî li dar xistine. Bi van çalakiyên jinan ku ji hemû çînên civakê hatine gel hev, jinan wêrektiya diyarkirina rûyê rast ê rejîmên faşîst, pêşkêş kirine.




Bi vî awayî, ji malbat û dayîktiyê re çawaniyeke ramyarî dane çêkirin. Di vê mijarê de, sergirtiyên spî "Dayîkên di qadên meha gulanê de- (Madres de palaza de mayo)" yên Arjantînê, hêmaya rewşeke cîhanî qezenc dikin.

Jinên Şîliyî, di destpêka sedsala 20′an de bi armanca ku karibin cîhanê bi nêrîna jinê şîrove bikin û hêza xwe ya rêxistinî pêk bînin, bûne partî. Lê ev gava yekem a serxwebûna jinê, bi bertek hatiye pêşwazîkirin. Jin, neçar tên hiştin ku rêxistinên lîberaltir ava bikin. Di salên piştî wê de, partiya jin a bi pêşengiya Maria de la Cruz **(Mariya dê la kiroz)** tê avakirin jî, nikare xwe bigihîne hêza nûnertiya berjewendiyên hemû jinan. Ji ber ku nikarîbû, ramyariyeke ku jinên ji hemû çînan bike yek, pêk bîne. Ya herî girîng jî, ji ber ku bernameya rizgariya jin û civakê bi dahûrîn û perspektîfeke xurt negirtiye dest, nikarîbû xwe ji belavbûnê rizgar bike.



Maria de la Cruz

Li Kûbayê, tabûra jinan a ku navê xwe ji navê dayîka şoreşgereke navdar digire "Maceo" Artêşa Sor tê avakirin. Jin, mafê ku karibin bi zilaman re wekhev şer bikin, dixwazin. Lê jin bi rengekî çalak tev li şer nabin û di eniyên paş de cih digirin. Sedema vê yekê, berteka ku şer karê jinê nabîne, ya rêhevalên wan ên zilam e.

Jinên têkoşer ên ku li Kûbayê bi çalakî tev li şer bûne û şehîd bûne, yên weke Lydia û Clodmîra jî derketine. Lê tevî ku rista van jinan a di serkeftina têkoşînê de diyarkere jî, nêrînên zilam ên der barê jinê de naguherîne.

Piştî şoreşê, di sala 1960′î de bi serokatiya Vilme Espin (Vêlma Espîn) re Federasyona Jinên Kûbayî (FNC Federation of Cuban Women) tê damezirandin. FNC, cesipandia nezanîna jinê, tevlêbûna wê ya ramyarî û civakî asteng dike, derdixe holê. Armanca FNC, jiholêrakirina pirsgirêkên rêxistinê, anîna jinên ji hemû çînan - jinên laşfiroş jî di nav de- a gel hev, pêşxistina çanda civaka neteweyî, pêkanîn û çarekirina pirsgirêkên jinan e.



Vilme Espin

Li Nîkaraguayê, ji ber ku jin di têkoşîna serbixwe ya Eniya Rizgariya Neteweyî ya Nîkaraguayê (FSLN) ( Eniya Sandîniya Rizgariya Neteweyî) de rizgariya xwe jî dibînin, bi awayekî çalak tevlî refên têkoşînê dibin. Berxwedana xwe ya li hemberî dîktatoriyê (Samasê) hevbeş dikin. Jinên Nîkaraguayî, di nava rêxistina FSLN'yê de, di rêxistina jinan a bi navê AMORGNAC'ê de cih digirin.





Armanca AMORGNAC'ê li hemberî taybetiyên paşverû yên civakî û kevneşopiyan bi awayekî rêxistinkirî têkoşînkirin e û vê diparêze. Piştîr e navê rêxistinê, tê guhertin navê yekem şehîda jin a şoreşê, "Yekîtiya Jinan A Luisa Amanda Espinoza". Lê tê kirin Yekîtiya jinan, bi pirsgirêkên jinan re, ên ji her beşê pêwendîdar dibe. Jin, di nava artêşê de jî cih digirin. Jin, bi qasî ku çalakger dibin jî, dîsa zêdetir bi nêzikatiyên desthilatdar û paşverû yên zilaman re rû bi rû dimînin. Li hemberî wan jî, têkoşînekê dimeşînin. Ev tevger, rê li ber zanista jinan a zayendî vedike. Yekîneyên li bajarê Leon ê Nîkaraguayê, jin didin damezirandin. Tevlîbûnên jinan zêdetir dibe. Şoreşa Nîkaraguayê ya 1979′an, weke şoreşa jinan jî tê binavkirin.




Luisa Amanda Espinoza

Li Meksîkayê EZLN (Artêşa Rizgariya Neteweyî Zapata) an jî Zapatîstan, di 1982′yan de ji aliyê komek Markos (Subcomande Markos) (berdefk û cîgirê rêberê tevgera Zepatîstan ne) ve tê damezirandin. Di rêbendana 1994′an de, li eyaleta Chiapasê (Eyaleteke Meksîkî ye) raperîna radîkal a li dijî dewletê, tê destpêkirin. û Jinên Zapatîst, serokatiya raperînê dikin. Jinên berxwedêr, piştî serkeftina di şerê yekem û şûn de di birêveberiya EZLN′ê (Artêşa Zapatîstan ji bo Rizgariya Neteweyî) de, cih digirin. Di Hêzên EZLN de, ji sêyan yek ên ku beşdarî birêveberiya leşkerî û civakî bûne, jin in. Jinên têkoşer, di her astê de erkê werdigirin. Vesazbûna sosyalîst a EZLN′ê ya girêdayî rêgezên wekhevî û azadiyê, her ku diçe zêdetir jinan dikişîne nava refên xwe. Piraniya şêniyên Zapatayî yên li Chiapasê, ciwan û jin in. Di birêveberiyê de girîngiya temen û zayendê tune ye. Di zagonên şoreşgerî de, mafên jinan ên cihgirtina di nava têkoşînê de, rêvebirina karên civakî, bûna xwedî kar, qezenckirina mafê rêbertiyê û tevlîbûna karên leşkerî hene. Ev zagon diyar dikin ku lêdan nabe li tu jinê bê kirin, li tu jinê kiryarên xerab nabe bên kirin, jin xwedî mafê bûna xwedî zarok e û ji bo lihevkirina zewacê, kes nikare jinê neçar bike.

Li Meksîkayê, daxwazên tevgerên xwecih ên jinan, ên ku bi daxwazên giştî re li hev dikin, hene. Du eniyên têkoşînê yên pêş hene, pêşveçûna her du eniyan jî dikarin pêk bînin. Jinên xwecih ên pir xizan û hatine derveyîkirin, Zapatîzmê berhêl dikin.

Jinên Zapatîst, parçeyekî pir girîng ên hewldana jinûavakirina civaka xwe ne. Jinan, di karên tenduristî û perwerdeyê de ristên girîng xistine bin ewlehiyê. Di civakên kevneşop ên xwecihî de, tenduristî û perwerde qadên wan bûn. Jin, di qada gelemperî di "artêşa Zapatîstan de Ramona", di protesto û civînên din ên Zapatîstan de, çêweyê bingehîn e. Comander Ramona, têkoşereke rast û damezirînereke rast a Zapatîzmê bû. Di hiş û xeyalê gelê xwecih de, Marcosla xwedî wê hemgirîngiyê ye. Marcos jî di navê de, her kes di wê ferqê de bû ku Ramona dilê tevgerê ye. Ew, rêxistinkera jinan bû. Bi salan jin birêxistin kirin, ew gav bi gav zana kirin û ji bo ku mafên xwe werbigirin, bû sedem ku jin rabin ser piyan. Comander Ramona, Komîteya Navendî bû. Anna Marîa jî serkêşiya hêzên şer dikir. Bêyî ku jin hebin, tevgera Zapatîst qet nedikarî bi ser bikeve.


Comander Ramona

# ROLA JINÊ LI BAŞÛRÊ EFRÎKAYÊ

Di 1948′an de nîjadperestiya rejîma başûrê Efrîkayê Apartheid, di ser hemû welat û jiyana civakî de xwe dida der. Jiyan, bi awayê reşik û spiyan, dibe du beş. Reşik, ji bo ku ji spiyan re kar û xebatê bikin, tên neçarkirin. Yên ku wêrekiya ji vê zagonê re bêjin na, nîşan dane; destpêkê jin in. Di sala 1956′an de dema ku birêveberiya rewşa awarte dewam dike, li tevahiya welat jî bi awayê koman dicivin û heta Preotariyayê (Prîtorya Bşûrê Afrîkiya) dimeşin.

**RONÎKIRIN**
Apartheid: Ew sîstema cudakirina nijadperestî ya spiyan ne ku bi hejmareke kêm li Başûrê .Afîkayê desteser bûne

9′ê Gelawêjê, 20 hezar jin zarokên xwe jî digirin gel xwe û zagona pasaportê protesto dikin. ANC (Kongreya Neteweyî ya Efrîka) 9′ê Gelawêjê weke roja jinan radigihîne. Tevgera jin, di nava kevneşopiya berxwedêr a vî welatî de xwedî cihekî girîng e. Dema ku ANC (Kongira Neteweyî ya Afrîkiya) di 1994′an de dibe desthilat, ji nû ve bernameya avakirin û pêşketinê dide destpêkirin. Hemû çavkaniyên welêt seferber dike.Tevahî bermahiyên Apartheidê radike û soza siberojeke li dijî nîjadperestiyê û zayendperestiyê dide. Makezagona başûrê Afrîkayê, eşkere dike ku ji aliyê etîk ve mafên mirovan û bi taybetî mafên jinê destek dike û li hemberî bijartina zayenda civakî rêzdar e. Di 1994′an de bi hatina desthilatdariyê ya ANC′ê re, jin di vê têkoşînê de bi endamên jin, cih digirin. Jinên ku hewl didin





Ala ANC

li başûrê Efrîkayê giyana federasyonê di nava ANC′ê de bidin jiyankirin, 28% di parlemenê de cih digirin. Nûnertiya jinan ên di asta wezaretan de pêş dikevin. Ji bo pêşxistina statûya jinê bi pirsgirêkên zayenda jin re têkildar, gelek komîsyon û yekeyên lêkolînan tên avakirin. Gelek rêxistinên jinan, ên weke" Federasyona Başûrê Efrîka, Yekîtiya Jinan ANC, Rêxistina Jinên Natalê û gelek sendîkayên rêxistinbûnê, tên avakirin. Cosatu û Fosatu (Yekîtiya Karkeran a Başûrê Efrîka) sêwana sendîkaya rêxistinên xwe pêk anîne û jinan di van sendîkayan de karîne pirsgirêkên xwe bixin rojevê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Jinên Şîliyî, çima bûn partî?
2. Çima Maria De La Cruz, nikarîbû xwe bigihîne berjewendiyên jinan?
3. Çima jinên Kûbayî, bi çalakî tevlî şer nebûn?
4. Armanca FNC'yê çi ye?
5. Çima jinên Nîkaraguayî, tevlî refên têkoşînê bûn?
6. Armanca AMORGNAC'ê çi ye?
7. Comander Ramona, bi kurtasî binirxîne.

WANE 3

## LÊGERÎNA AZADIYÊ YA ROJHILATA NAVÎN HAY GÎN(JINA ERMENÎ)

Nivîskarên femînîst ên ermenî, di dawiya sedsala 19′an û destpêka sedsala 20′an de, di nivîs û kovarên ku jin diweşînin de, rêxistineke jinê bi pêş dixin.



Di van nivîsan de, bi giştî pirsgirêkên ku jinên ermenî jiyan dikin, digirin dest û dixwazin çareyan peyda bikin.

Di wê qadê de nivîskarên ermenî Elbîs Giesaratsyan (1830-1911),

Sirpuhî Dusap ( Serbûhî Dosasb) (1841-1901),

Zabel Asadur (Zabîl Asador) (1863-1934),

Hayganuş Mark (Hayganûş Mark) (1885-1966) e.



Zabel Asadur

Ew jin, kovarên weke: (Gîtar, Dzagîç-Gul, Hay Gîn-Jinên Ermenî) derdixin. Bi nivîsên kovaran re, dixwazin ji bo jinên ermenî hezkirinê, perwerde û şaristaniyê pêş bixin. Di wêjeya ermeniyan de, der barê rewşa jinê ya civakî û dadî de, nivîsan dinivîsin. Saziyên jinan, ên weke: Yekîtiya Jinên Perwerdehêz, Saziya Jinên Ermen ên Welatparêz, ava dikin.

Armanca van saziyan: ji bo perwerdeya jinên ermenî, jidil perwerdekirin û birêxistinkirina mamosteyan e. Her wiha, fêrkirin û

parastina zimanê ermenî ye. Pirtûkên wane û zanîna zimanê ermenî derdixin. Bi girtina Hay Gîn re, (1934)'an ev kevneşopiya ku ji pirsgirêkên jinên ermenî re li çareseriyê digere, bi dawî dibe.

## AFÎRÎNERÊN RAPERÎNÊ (ÎNTÎFADA)



Jinên filistînî, di têkoşîna rizgariya neteweyî de, ji pêvajoyên destpêkê ve di nava têkoşînê de bi awayekî çalak cih digirin.

Jinên filistînî, nirxên xwe yên herî birûmet dixin bin xizmeta şoreşê. Di raperînê de jî, ristên pêşengtiyê dilîzin.

**Jin û zarok,** di raperînê de bi hêza xwe ya çalak li dijî dijmin, encamên serkeftî bi dest dixin. Li gel ku têkoşîna li Filistînê, şoreşeke jinê ye jî, lê pêşketina rêxistinên xweser ên jinan sînordar in.





**Li Filistînê jin,** di destpêkê de neçar dimînin ku xwe bi zilaman bidin pejirandin. Kêrhatinên jinên filistînî hene. Ji zilaman baştir şer kirine. Lê belê weke zayend, pêşketineke rêxistinî nîşan nadin.

Mînaka vê ya herî balkêş jî, revandina balafirê (di 1969′an de balafira ku ji Tel Avîvê diçe Los Angelesê, direvînin û li Sûriyeyê dirûxînin) ye. Ya vê çalakiya dîrokî dide pêkanîn û navê Filistînê bi giştî cîhanê dide haydarkirin, Leyla Xalid e ,ya ku niha jina malê ye.

## RAWA

Yekîtiya Jinên Şoreşger a Efxanistanê (RAWA), ku di sala 1977′an de li Kablê, di pêşengiya Mîna Keşwar Kemal de hatiye damezirandin, rêxistineke serbixwe ya jinê ye. RAWA, di destpêkê de ji bo mafên jinê, mirovan û dadweriya civakî  têdikoşe.



Mîna Keşwar Kemal

Di sala 1992′yan de mafên jinan; di qadên civakî, aborî, çandî û ramyarî de bandora xwe nîşan dide. Daxwazên xwe yên di van mijaran de diyar dikin. RAWA, di destpêka salên ku hatiye damezirandin de, li hemberî dagirkeriya Sovyetê, têkoşînê dimeşîne. Piştî wê, li hemberî rêjîmên Mucahîdîn û Talibanan, têkoşînê dimeşîne. Di van salên dawî de li hemberî dagirkeriya Emerîkayê jî, bênavber têkoşîna berxwedaniyê dimeşîne. Ji ber vê yekê, di navbera salên 1992 û 1996′an de, bi hezaran jin di îşkenceyan re tên derbaskirin. RAWA, bi giştî ji bo jinên efxanî, dibistanên veşartî ava dike û kovarê diweşîne. Projeyên mirovan hildiberîne, xebatên xwe di nava

mercên pir zor de dimeşîne. Ji ber çewisandina pergalê, cihên xebatên girêdayî xwe nikarin vekin û kovara bi navê "Payam-e Zan" (Peyama Jinê) nadin weşandin.

## JINÊN CEZAYÎRÎ



Li Cezayîrê, li dijî dagirkeriya fransiyan, jina Cezayîrî li ber xwe daye. Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Cezayîrê (FLN) ya bi giştî xwedî kesayeteke baviksalarî ye, tevlîbûna jinê ya têkoşînê, pir bi zorê pejirandiye.

Her ku jinê bi afirîneriya xwe, xwe isbat kiriye, ev ast derbas kiriye. Di encamê de FLN dipejirîne ku mafê tevlîbûna têkoşînê ya hemû jinan heye.



Cemîla BopaŞa

Di FLN ya ku xwedî avaniyeke baviksalarî ye, nayê hêvîkirin ku jin erkên stratejîk werbigirin. Jin, bi piranî di eniyên paş de cih digirin. Piştî ku çalakiyên rêxistinê belavî derveyî Cezayîrê dibin û şûn de, jin çalak dibin. Di 1957'an de, jina têkoşer a bi navê "Cemîle" ji aliyê Fransayê ve tê girtin û sizaya darvekirinê lê tê birîn. Bi parastina ramyarî ya ku kiriye, jinên Cezayîrê bi hemû cîhanê dide nasîn.

Di nava kesayetên diyar ên vê şoreşê de, Cemîla Boheyrid û Cemîla Bopaşa jî hene. Çewisandinên civakî yên ku di şoreşa

Cezayîrê de li ser jinê hatine sepandin, lêgerînên jinan ên azadiyê teng kirine. Ji ber vê sedemê, jinan rêxistina xwe ya xweser pêk neanîne û statûya pêşengiyê bi dest nexistine.



Cemîla Boheyrid

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Sedsala sosyalîzmê, kengî dest pê kiriye?
2. Rista jinê ya di sedsala sosyalîzmê de, çi bû?
3. Kovarên ku jinên Ermenî nivîsîne, çi ne?
4. Armanca saziyên jinên Ermenî, çi bû?
5. RAWA, ji bo kê û çi têkoşîn dimeşand?
6. Li ser jineke têkoşer, lêkolînê bikin?

# JINÊN KURDISTANÎ -1

Giyana kurdan a berxwedêr û cewhera welatparêziya xwe, di jina kurd de domandiye. Jina kurd, xwedî taybetiyên berxwedêr, serhildêr û şerker e. Droysen, di pirtûka xwe ya bi navê; "Îskenderê Mezin" de, dibêje: "Di sefereke Îskender a Rojhilat de parêzgerek Medyayî ji bo di artêşa Îskender de şer bikin, 206 jinên kurd ên şerker dişîne."

Di sedsalên 7 û 8′an de û 12 û 13′an de, di nava Yaresanan de bi taybetî nêzî 12 an jî 15 jinên helbestvan hebûn. Hin ji wan; Celale Xanima Loristanî, Dayê Tewraza Hewramî, Rihan Xanima Loristanî, Lîza Xanim, Nazdar Xatûn û Nêrgiz Xanim in.

Li derveyî helbestkariyê, taybetiyeke ku van helbestvanên jin girîng dike jî; di heman demê de pêşengên olî ne. Mehmet Bayrak, di nivîsa xwe ya bi navê; "Dîroka Wêjeya Kurdên Sersor" a qedexe de dibêje: "Afirînerên berhemên helbestî yên di rîtuelên Yaresanan de bingeh girtine, di heman demê de nivîskarên pirtûkên pîroz jî bûn. Ne tenê berhemên helbestî, metnên (nivîsarên) olî yên ku bingehên sincî, şîretên olî û perestinê diyar dikin jî, beşek ji aliyê mêr, beşek ji aliyê jinan ve hatine nivîsîn."

## ŞECERET EL DUR

Şeceret El Dur; di dema birêveberiya Selahadînê Eyubî de, jiyan kiriye. Piştî kuştina kur û hevjînê wê, dibe keybanûya Misirê. Li gorî zagonên îslamê, birêvebertiya jinê qedexe ye. Ji ber vê yekê, ji aliyê zilamên serdest ve ji vê erkê tê girtin. Di sala 1257′an de tê kuştin.



## XATÛNA ZADÎNE

Xatûna Zadîne: Şah Ebasî ku birêveberê wê demê bû, dixwest Kelha Dimdimê ya li Rojhilatê Kurdistanê bi dest bixe. Di şerê ku diqewime de kurd bi bin dikevin. Piştî şeş salan, carek din li ber xwe didin. Hevjîna Mîr Ebdela Xan, Xatûna Zadîne piştî mirina wî, dibe birêvebera herêmê. Bi artêşeke ji hezar leşkerî pêk tê, êrîşî ser leşkerên li Kelha Dimdimê dike û kelhê bi dest dixe.

## SULTANA XANZADE

Sultana Xanzade: 13 salan birêveberiya herêma Soran-Herîrê kiriye. Di wê demê de leşkerên Îranê, her tim êrîşî vê herêmê dikin. Xanzade Sultan, fermandariya artêşeke ku ji 12 hezar leşkerên çekdar ên peya û deh hezar siwarên tîrvan pêk tê, dike. Li dijî êrîşên bêmaf ên artêşa Îranê, Sultana Xanzade bi artêşa xwe êrîşî leşkerên Îranê dike. Di encama van êrîşan de digihêje sînorên Hemedan, Dergrizîn û Cancanapê.

## XATÛ ŞAHNAZ

Xatû Şahnaz: Keça Mewlana Yaqûbê Erdelanî ye. Xatû Şahnaz, hevjîna yek ji pêşengên herêmê yê navdar Helo Xan e. Xatû Şahnaz, yek ji mînakên bijare yên berxwedêriya kurdan e.

Di şerê ku di navbera Erdelaniyên Sinê û Îranê de tê meşandin, Îran piştgiriya Loristaniyên Îranê dike û Erdelaniyan tengav dike.

Xatû Şahnaz, ji jinên ciwan ên Erdelanî re wisa diaxive: **"Yên ku ji bav û birayên xwe hez dikin, bila cilê zilaman li xwe bikin û bên qada şer. Yên dixwazin dîl bikevin destên Îraniyan, bila bimînin."** 500 jinan bersiv dan vê banga Xatû Şahnazê. Vê artêşa mezin, cilê zilaman li xwe kirin, şûr rakirin, li hespan siwar bûn û di bin pêşengiya Xatû Şahnazê de, ketin ser rê. 500 jinên wêrek, sê rojan di şer de mil bi mil li gel mêran şer kirin. Îranî jî û Erdelanî jî bi paş ve vekişiyan. Fermandar Xatû Şahnazê planek çêkir û ji şervanên xwe re got: Bibin çar bir. Ji çar baskan ve êrîşî Îraniyên ji ber bahozê reviyabûn û ketine konên xwe kirin. Fermandarê wan kuştin û artêşa Îranê belav kirin.

## MAH ŞEREF XANIMA KURDISTANÎ

Mah Şeref Xanima Kurdistanî: (1804-1848)'an 20 hezar beyt, helbest û dîwan nivîsandine. Ji van tenê 2 hezar çarik hatine komkirin. Ev dîwan, nêzî 39 salan piştî mirina wê, bi navê Dîwana Mah Şeref Xanima Kurdistanî, di sala 1886'an de hatiye çapkirin. Her wiha, pirtûkeke wê ya bi navê, "Tarîxî Kurdistan" ku piranî dîroka kurdên Erdelanî vedibêje, heye.

Ber bi dawiya şerê cîhanê yê yekem ve, li Stenbolê di nava Tealî Cemîyetî Kurdistan de, cara yekem jinên kurd rêxistineke xweser ava dikin. Komeleya Jinên Welatparêz ava dikin. Seroka Cemiyetê, Xanima Yalmukî ye. Ev rêxistin, bilindkirina asta civakî û daneheva rewşenbîrî ya jinê armanc dike. Lê pir teng û bi beşeke civakê ya jor re, sînordar dimîne. Di temenkurtî û domnekirina komeleyê de jî, sedema bingehîn ev e. Li gorî nêrîneke din jî, "Ji ber hîlekarî û lêpirsînên nijadperestên Konstantinopolis." (1928-Tiflis- Rojnama-Zarya Vastoka – Hejmara 297- Dilara Xanimê) hatiye girtin.



## HAFSE XANA NEQÎP

Hafse Xana Neqîp: di 1891'ê de li Silêmaniyê ji dayîk bûye. Di salên şer de nasnameyeke girîng a jineke ku bi zanabûna xwe, jinên kurd birêxistin kirine û di jiyana civakî de bibandor e. Jinên ku ji ber xizanî û çewisandinê tengasiyê dijîn, xwe dispêrin Hafse Xanê.



Ew, ji aliyê civakî ve birêvebera jinan bû. Xebatên xwe yên jin û Kurdistanê yên ku di hizira wê de pir dişibin hev, bi hev re dan meşandin. Di sala 1930'î derbarê mafên neteweyî yên kurdan de nameyekê dinivîse û ji bo Cemiyeta Miletan (NY) dişîne. Ev, bi navê kurdan destpêk bû.

Hafse Xan, ji bo zanabûna jinên kurd, pir zêde xebitiye.

Di damezirandina rêxistina Yekîtiya Jinên Kurdistanê de cih girtiye û jê re serokatî kiriye. Her wiha, dibistaneke şevê ya xweser ji bo jinan vekir. Ev yekem dibistana jinên kurd bû. Ji bo alîkariya Komara Mehabadê ya di 1946′an de hat damezirandin, xebitiye. Paşê neçar maye, biçe Îranê. Hafse Xana Neqîp, her tim bawer kir ku mirovahî di xeteke mirovperwer de dikare biguhere û veguhere. Hafse Xana Neqîp, yek ji nûnerên çanda jinê ya dema xwe bû. Ji bo nasnameya xwe ya zayend û nîjadî têkoşîn dikir. Bawer dikir ku divê hemû mirov li gorî mafên xwe yên cîhanî yên ku ji dayîkbûnê ve tên, bijîn. Wekhev nêzî mirovên ji her gelî dihatin, dibû. Hafse Xana Neqîp, ji ber nexweşiya pençeşêrê, di 15′ê Cotana 1953′yan de jiyana xwe ji dest da.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima Şeceret El Dur, li ser textê serweriyê nema?
2. Xatûna Zadîne, çawa Kelha Dimdimê bi dest dixe?
3. Banga Xatû Şahnazê ya ji bo jinên Erdelanî, çi bû?
4. Xatû Şahnaz, ji bo binxistina artêşa Îranê, planek çawa danî?
5. Hafse Xanê, ji bo jinên kurd, kîjan xebat meşandiye?

WANE 5

# JINÊN KURDISTANÎ - 2

## RINDEXANA MALA ELIYÊ ÛNIS

Rindexana Mala Eliyê Ûnis: bi xweşikbûn û lehengiya xwe li herêmê deng vedide. Bi şerkeriya xwe li herêmê dibe efsane. Mala Eliyê Ûnis, li herêma Xerzanê, piranî li Sasonê û li derdora Çiyayê Mereto dimînin. Mala Eliyê Ûnis, piştî ku serhildana Şêx Seîd têk diçe, di sala 1926'an de serî li hemberî Kemalîstan radikin. Di Çiyayê Mereto de li ber xwe didin û heta salên 1934'an jî, dewlet di her êrîşê de bi bin dikeve.


Rindxana Mala Eliyê Ûnis

Li hemberî van serkeftinên kurdan, bi rêya eşîrên kurdan di sala 1937'an de êrîşê dibin ser Çiyayê Mereto. Eşîra Cemîlê Çeto, pêşengiya leşkeran dike. Hema piraniya eşîrê tên kuştin. Qirkirinek pêk tê, ji deh hezarî zêdetir kes tên kuştin. Rindexan, ji destpêkê ta dawiya şer, di rêza pêş de şer dike û bi birîndarî dikeve destên dijmin. Fermandarê dijmin, hewl dide dest bavêje Rindexanê. Rindexan, xwe ji Pira Malabadê davêje Çemê Batmanê.

## KEÇA NEXEDEYÎ

Di 25'ê Gilawêja 1941'ê de Yekîtiya Sovyetan û Îngilîzan, beşeke girîng ji erdnîgariya Kurdistanê dagir kirin. Di wan deman de,

Keça Nexedeyî şervaneke gelê kurd a di refên herî pêş ên şoreşa Nexede û Mehabadê de, cih digire.

Di 1942′yan de Komeleya ku veşartî dixebitî, bi navê “Partiya Demokrat a Kurdistanê” ragihandina xwe ya fermî kir. PDK-Îran, girêdayî Sovyetan bû. Keça Nexedeyî jî, alîgira têkoşîna serxwebûna kurdan bû. Lê dîsa jî di yekane tevgera kurdan a dema xwe de cih girt. Di 1946′an de Komara Kurd a Mehabadê hat damezirandin. Ji ber ku xwe ne spart hêza gel a cewherî, piştî 11 mehan hilweşiya. Keça Nexedeyî ya di pêvajoya têkoşînê de risteke çalak lîst, nekarî vê rewşê bipejirîne. Di demeke kurt de Qazî Muhamed, birayê wî û Qadî Seyfî hatin girtin. Di meydana Çarçira ya ku Komar lê hatibû ragihandin de, hatin darvekirin. Di nava yên ku ketin girtîgehê de, keça Nexedeyî jî bû. Bi rojan îşkence li Keça Nexedeyî hat kirin û çavên wê hatin derxistin. Dijmin jê xwest ku lêborînê bixwaze. Wê carekê tenê jî negot ‘ax’ û lava nekir. Bi şanazî, tîk li ser piyan, serbilind çû sêdarê. Hêrsa Keça Nexedeyî, tenê nemeşandina kurdan a têkoşîna serbixwe bû.

## DAYÎKA GULNAZ

Serhildana Şêx Seîd, bandora xwe li ser hemû Kurdistanê dewam dikir. Berxwedana ku li derdora Xoybûnê dihat meşandin, li Agiriyê Îzzet Begê dimeşand.



Gulnaz Xanim

Gulnaz Xanim, xwişka Îzzet Begê bû. Ji zarokatiya xwe ve, şahida berxwedanê bû. Her mezin dibû, têkiliya wê ya bi ramyariyê re, zêde dibû. Jîriya wê ya ramyarî, axaftinên wê yên ku di civînên veşartî de dikirin û bi pêşniyarên ku dikirin, bala her kesî dikişand ser xwe. Di 16′ê Gulana 1926′an de, serhildana Agiriyê dest pê kir. Gulnaz Xanim, bi awayekî çalak beşdarî van pêvajoyan bû. Li gel Îzzet Begê, ji bo pêkanîna rêxistina navxweyî, di hevdîtinên bi eşîran re cih girtibû. Serhildanê heta Rezbera 1930′yî dewam kir û piştre hat çewisandin.

Gulnaz Xanima ji Agiriyê, li gel hejmareke zêde ên endamên Xoybûnê hat girtin û ket girtîgehê. Di dadgeha xwe de got: **“ta ez sax bim, ez ê ji bo Kurdistanê şer bikim û ez di doza xwe de mafdar im.”** Ew xistin girtîgeha Muşê. Serê birayê wê Îzzet Beg û kurê wê Sedîq ên hatine jêkirin, ji wê re anîn. Wê destpêkê xwe li ber serê birayê xwe yê jêkirî tewand, qehremaniyên wî vegotin. Piştre destê xwe dirêjî serê kurê xwe yê jêkirî kir û çavên wî gemirand. Got**: ”Ev ciwangayê min e, min ji bo vê rojê şîr da wî. Ger ji bo doza Kurdistanê min mirina wî ya bi vî awayî nedîtibûya, min ê şîrê xwe lê helal nekiribûya.”** Dayîka Gulnaz, bi qasî ku rêxistinkerek bihêz bû, ew qas jî dayîkek baş bû. Yekane daxwaza wê ew bû ku hemû dayîkên kurd zarokên xwe, bi ziman û çanda kurdî mezin bikin.

## BESÊ

Besê: hevjîna rêberê serhildana Dêrsimê, Seyîd Riza ye. Bi hêza xwe ya cewherî, bawerî, welatparêzî û biryardariya xwe beşdarî serhildanê dibe. Besê, pir fedakar û şerker bû.

Di heman demê de, di bikaranîna çekê de jî hosta bû. Rojnamevan Barbaros Baykara, di pirtûka xwe ya ku serhildana Dêrsimê vedibêje de, wisa behsa Besê ya ta fîşeka xwe ya dawiyê şer kiriye, dike, “Jineke dilêr û ta dawiyê berxwedêr bû. Besê, ji tehtên ku bizin jî nikarin lê bigerin, bi kulmek mirov re li hemberî artêşeke leşker, a herî girîng jî firokên ji asîman mirinê dibarînin ta fîşekên wê diqedin, şer dike. Dema fîşekên wê diqedin, bi keviran êrişî leşkerên nêzî wê dibin dike. Dema fêm dike ku dê were girtin, diqîre û dibêje: **(hûn nikarin min sax bigirin)** û xwe ji zinaran davêje.”

Besê, êdî di kevneşopiya ku jinên kurd nekevin destên dijmin û xwe ji zinaran davêjin de, bûye pêşeng. Di serhildana Dêrsimê de 1500 keçên ciwan ji bo nekevin destên dijmin, xwe ji zinar û kendalan davêjin. Xwe davêjin av û agiran.

## ZERÎFE

Elîşêr û Zarîfe, ji navên ku di dîroka Kurdistanê de bi hev re bûne sembol. Di salên destpêka ciwaniya xwe de, jiyana xwe dikin yek. Her du, di tevahiya dema hevjîniya xwe de, li ser pêkanînên berpirsiyariyên xwe yên li hemberî gel lêhûrbûnê dikin.

Di dema şerê yekem ê parvekirina emperyalîst de, cara yekem



derfetên çalakirina têkoşîna xwe dîtine. Bi Rûsyayê re hevdîtin û bi Ermeniyan re têkilî danîn. Berpirsiyariya herêmên Sêwas, Meletî û Dêrsimê hildigirin. Di 1914′an de ji bo Kurdistaneke azad bi dest bixin, xebatan didin destpêkirin. Di Cemîyeta Tealî Kurdistan, di sala 1919′an de, bi nameyekê diyar kirin ku kurdên Dêrsim û Koçgiriyê girêdayî Cemiyetê ne. Elîşêr û Zarîfe, di raperîna gelê Koçgiriyê de fermandariya artêşa ku pêk hatiye, bi nazikî wergirtin.

Piştî têkçûna tevgera gel a Koçgiriyê, Zarîfe bi hevjîn û rêhevalê xwe Elîşêr re derbasî Dêrsimê bûn. Dozên xwînê yên di navbera eşîrên Dêrsimê de radikin û gel ji bo yekîtiyê perwerde dikin. Zarîfe, di vê mijarê de bi sekna xwe ya şanaz û baweriya ku daye gel di nava civakê de cihekî rêzdar girtibû. Zarîfe, di karanîna çekê de pispor bû. Zarîfe û Elîşêr, di heman demê de hejmareke zêde bi zimanê tirkî, kurdî, zaravayê kurmancî û zazakî helbest û nêrînên xwe yên li ser tevgerên gel nivîsîbûn. Biraziyê Seyîd Riza, Reyberê Qop, bi hêzên dewletê re li dijî rêxistina gel a li Dêrsimê li hev dike û dibe sîxûrê dewletê. Armanca Reyber, jiholêrakirina Zarîfe û Elîşêr e. Di 9′ê Tîrmeha 1937′an de komeke ku Reyberê Qop şandiye; Elîşêr, biraziyê wî û Zarîfeyê dikujin. Xayîn, serê Zarîfe û Elîşêr dibirin. Tiştên wan ên nirxdar, belge, pirtûk û lênûsên wan digirin û radestî biryargeha leşkerî dikin.

# MARGARET GEORGE

Margaret George (Margirêt Corc)-Pêşmergeyek Sûryanî:

Margaret, jineke pêşmerge ye ku di salên 1960'î de navdar e. Ji ber ku ew pêşmerge bû, ji aliyê mirovan ve dihat hezkirin. Wêneyên wê yê bi cil û bergên pêşmergetiyê, nîşan dan ku rêya çiya ji hemû jinan re vekiriye. Lê jinên din ên ku li Başûrê Kurdistanê jiyan dikirin, bi qasî Margaret ne bişens bûn. Di wan mercan de ji bo jinên din, nasnameya misilmantî weke astengiyekê bû. Bêyî destûra malbata xwe, nikarîbûn biçûna çiyayan. Bav, bira û xwişka Margaret, bi wê re bûn. Wênekêşê kurd Zahir Reşîd ê ku wê demê wêneyê wê kişandibû, wisa qal dikir: "Ez Margaretê baş nas dikim. Wê demê dihat Kelha Dêze. Pir caran dihat studyoya min a wêneyan. Ji ber ku ji wêneyan pir hez dikir. Pir mirov dihatin wêneyên wê ji min dixwestin. Bi taybetî jî, kurdên Îranê. Ji ber ku ew, pêşmergeyeke li çiya şer dikir û navdar bû. Pêşmergeyên li çiya jî wêneyên wê li gel xwe digirtin." dawiya jiyana Margaret bi êş e. Tê angaştkirin ku fermandarekî pêşmergeyan xwestiye pê re têkiliyê çêke, lê dema ku wê ev red kiriye, bi awayekê nediyar hatiye kuştin. Lê ew di bîra kurd û suryaniyan de qehremanek e.



Margaret George

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Rindexana Mala Eliyê Ûnis, binirxîne.

2. Encama êrîşa li ser çiyayê Mereto, çi bû?

3. Taybetiyên Besê, çi ne?

4. Besê, bi çi awayî jiyana xwe ji dest daye?

5. Elî şêr û Zarîfe kî ne?

6. Li ser jiyana jineke berxwerdêr a kurd bi hevalên xwe re lêkolîn bikin.

# JINEKE BERXWEDÊR A KURD LEYLA QASIM



Şêweya guhertinê ya di nava civata Kurdistanê de pêwîst e guhertinek ramyarî, civakî û aborî be. Ger gelê kurd mafên xwe yên ramyarî û dadî nestîne, dê mafên jina kurd jî her tim bên binpêkirin.

Leyla Qasim, di sala 1952′yan de li bajarê Xaneqînê ji dayîk bûye. Di nava malbateke hejar û welatparêz de mezin bûye. Malbata Leylayê, di sala 1971′ê de koçberî bajarê Bexdayê bûye. Leylayê, dibistana seretayî û navîn li Xaneqînê xwend. Di zarokatiya xwe de pir şareza û têgihiştî bû. Dibistana amadeyî li bajarê Bexdayê qedand û paşê di beşa wêjeyî şaxê civaknasiyê de, ya zanîngeha bajarê Bexdayê, hat pejirandin.Leyla, bi rêya birayê xwe yê mezin, şehîd Selam Qasim, di sala 1970′yî de bi awayê fermî, bû endama Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê. Xebata xwe di nava xwendekarên kurd de da destpêkirin. Her kesî digot: “Jin, nikarin tevlî karê mêran û xebata şoreşgerî bibin. Xebatên jinan, ji yên mêran cuda ne.”

Leyla Qasim, biryar da ku bi awayekî çalaktir li bajarên Iraqê bixebite. Di 11′ê Avdara sala 1970′yî de, di çarçoveya Iraqê de otonomî ji kurdên Başûrê Kurdistanê re hat diyarkirin. Ev rewş, heya Rezbera sala 1974′an dom kir. Rêjîma Iraqê, dîsa li dijî kurdan şerekî giran û hovane da destpêkirin. Rewşeke tijî tirs, ji azadîxwazên kurd û ereb re afirandin. Her wiha, li Kurdistanê jî bi dehan gund hatin wêrankirin. Di 24′ê Avdara sala 1974′an de, bajarê Qeladizê jî bi giranî hat bombarankirin, ku di encamê de çend xwendekarên kurd jî li wir şehîd bûn.

Leyla Qasim û Cewad Hemewendî, xebatên xwe li bajarê Bexdayê domandin. Roja 28′ê Cotana 1974′an Leyla û çar hevalên wê (Hesen Heme Reşîd, Nerîman Fuad, Azad Silêman Mîran û Cewad Hemewendî) hatin girtin. Rejîma Bexdayê, di çapemeniyê de ew weke terorîst dan nasandan. Leyla û hevalên xwe, di girtîgehê de rastî îşkenceyên pir giran hatin. Bi lez û bez doza wê û çar hevalên wê, bi dawî bû. Der barê wan de biryara darvekirinê wergirtin. Di roja 12′ê Avdara 1974′an de saet 7′ê sibehê Leyla Qasim û hevalên wê hatin darvekirin.

Leyla Qasim; keçek wêrek, zîrek, xweşbêj, esmer, bejn bilind û şêrîn bû. Di karê rêxistinî û hizbayetiyê de jî bi rêkûpêkî erkên xwe bi cih tanî. Di dadgehê de bi dengekî bilind, wisa got: **"Min bikujin, lê vê rastiyê jî bizanin ku bi kuştina min, dê bi hezaran kurd ji xewa giran şiyar bibin. Ez pir kêfxweşim ku bi serfirazî û di rêya azadiya Kurdistanê de canê xwe feda dikim."**

Berpirsiyarên dewleta Iraqê, jê daxwazkirin ku bi nameyekê ji bo serokomarê Iraqê, daxwaza lêborînê bike û poşmaniya xwe diyar bike. Lê Leyla Qasim, tif rûyê generalên Baasî kir û got: **"Ger ku ez ji karekî jiyana vê cîhanê poşman bibim, ew e ku ez zû dimirim, bêyî ku karîbim demek dirêj ji gelê xwe re xebatê bikim. Ger bê xwestin ez lêborînê ji kesekî bixwazim, ez daxwaza lêborînê ji gelê kurd dikim. Ji ber ku min ji bo doz û pirsgirêka neteweya xwe kêm xebat kiriye."**

Encama ku we li ser vê lêkolînê derxist çi ye? Bi mamoste û hevalên xwe re nîqaş bikin.

# BEŞA 2

## ERKÊN JINEOLOJIYÊ

1. Rastavakirina hevjiyana azad
2. Hevjiyana azad 2
3. Avakirina ronakbûna jinê
4. Şoreşa di zanistên civakî de
5. Rêxistina rêbaza lêkolîneke li gorî rastiya jinê
6. Serhildana mêtingeha herî kevn
7. Girîngiya parastina cewherî ji bo jinê
8. Jin, heta dawiyê heyîneke nirxdar e

WANE 1

# RASTAVAKIRINA HEVJIYANA AZAD

Jineolojî, di heman demê de, navê pêşxistina teoriya hevjiyana azad û afirandina civaknasiya wê ye. Dibe ku ji abeceyên civaknasiya rast û jiyana rast jî, pêşxistina hevjiyana azad be.

Ramyarê civaknasiya azadiyê Abdulah Ocalan dibêje: "Divê mirov baş zanibe ku hevjiyana azad, bi awayekî civakî hatiye avakirin. Ev jiyan, di navbera nêr û mê de pêk nayê; di navbera jinîtî û mêrîtiya civakî ya avakirî de pêk tê. Divê neyê jibîrkirin ku avabûna serdestiyê, her du zayend jî seqet kirine. Têkiliya di navbera wan de ji wê bandor bûye. Weke têkiliya serdest xwe nîşan daye. Di têkiliya serdest de eşq bi pêş nakeve. Di eşqa mirov de mercê bingehîn ew e, divê her du alî xwedî vîna azad a wekhev bin."

Mirov heta li têkiliyên di navbera jin û mêran de serwext nebe, nikare li tu pirsgirêka civakî bi temamî serwext bibe, ne jî dikare ji hev derxe.



Di bingehê pirsgirêkên civakî de, pirsgirêk di têkiliyên jin û mêran de hene. Saziya zewacê ya bi awayekî yek alî di civaka hiyarerşîk û civaka şaristaniyê de li ser jinê hat ferzkirin, serweriya mêr a piralî ava kir. Statuya pêşî ya civakîbûn, çînayetî û netewetiya serdest-bindest, timî li ser vî bingehî ava dibe. Di binê her şer û pevçûnê de jî ev rastî heye. Tiştê ku dîroka şaristaniyê û qonaxa wê ya herî dawî moderníteya kapîtalîst herî zêde li ser wê girtiye, ew berovajî kiriye û neyinî nîşan daye, rastiya der barê statuya koletiya jinê ya li ser vî bingehî ye.

Ev çespandin, rave dike ka ev mijar çima abeceyên jiyanê ne. Pirsgirêka ku ji têkiliya di navbera du mirovan de derdikeve, pirsgirêkeke civakî ye. Di navbera du zayendan de asta gelek têkiliyên civakî, ramyarî, çandî, hunerî, aborî, etîk û estetîk çawa tên nasandin û sererastkirin, mijareke ku hemû civakê eleqedar dike.



Têkiliyên jin û mêr, îro li her devera cîhanê bi aloz û pirsgirêk in û hilweşiyane. Bingeha jiyaneke watedar, azad û demokratîk, bi hişmendî, sinc û çanda van têkiliyan ve girêdayî ye. Zanistên civakî, nekarîne dahûrînên baş ên ku ji bo vê pêwîst in, baş pêş bixin. Her jin û mêrê ku ji mirov, jiyan, xweza û hebûna xwe re rêzdar e, xwedî berpirsiyariyeke wisa ye ku di vê mijarê de ronî û Serwext bibe, xwe perwerde û ava bike.

Eger wê jiyan bê jin û mêr nebe û bi halê heyî di navbera her du hebûnên bingehîn de, jiyaneke bi aloz heye; jineolojî dê destpêkê li ser vê mijarê bisekine. Di serê behaneyên (hicet) derketina zanista jinê de, aloziya jiyana civakî ye, bi gotineke din awayên wê yên bikaos (tevlîhev) hene.

Qada ku ev kaos tê de zêdetir kûr e, qada hevjiyanê ye. Ji bo ku em alozî û kaosa ku heye watedar bikin, divê em pêşketina dîrokî ya têkiliyên hevjiyanê zanibin.

Abdulah Ocalan, vê pêwîstiyê wisa dinirxîne: “Nasnameya herî radîkal û azadîxwaz, bi nêzikatiya ji jinê re yan jî bi tevahî bi têgihîştina pergala di têkiliyên jin û mêr de û bi derbaskirina vê gengaz e. Ta têkiliyên di navbera jin û mêr de neyên têgihîştin, tu pirsgirêka civakî; ne dikare baş were têgihiştin, ne jî dahûrandin. Ji bo vê pirsgirêka ku di dil û mejiyê pirsgirêkên civakî de quncika sereke digire, çareser bike; divê mirov nêzikatiyên zanistî, felsefî, etîk û estetîkê bingeh bigire…

Ta mirov nizane di dîroka şaristaniyê û dema nûjen de jin kirine

rewşeke çawa, hêza nêzikatiya etîk û estetîk nîşan nade. Bi hev re kî-jan cure bê ceribandin bila bê ceribandin, her jiyana ku bê jiyankirin; wê bi şaşîtî, bê sincî û kirêtiyê ve encamdar bibe."

Îro her devera cîhanê, ji ber vê sedemê bûne diyarê dojehê. Jiyana rojane, lêgerînên li ser navê eşq û hezkirinê, zayendîtiyên hatine sorkirin, nezanî û bêberpirsiyariya jin û mêr a der barê hev de, tenêtiyên di nava qerebalixan de tên jiyankirin.

Di encamê de cîhan dibe gerestêrkeke qada wan kesan ku her roja diçe di nava van ceribandinan de difetisin. Her kêlî û qada jiyanê, ji hev re dikin dojeh. Bi taybetî mêr, nikare jinê, weke; mirovek, dostek, hevjîneke jiyanê, hevjiyana ruh, bibîne. Ji ber ku çanda desthilatiya baviksalarî, jinê di bin çewisandin û venêrîna bêsînor de weke; bindesta xwe, mêtingeha xwe, jina xwe, yara xwe û samana xwe dibîne.

Ajoyên zayendî, bi destên pergalê ji sorkirinê re tên eyarkirin. Mêr, bi bandora van ajoyan, jinê weke tiştekî ku wê pê zewqên xwe yên zayendî têr bike, dibîne. Dema hînbûn û paşverûtiyên jina kevneşopî jî tevlî van dibin; jin ji gengaziya sekna azad û birêgez ya ji mêr re, mêr jî ji ya jinê re, weke xefik tê danîn.

## ZANYARÎ, FELSEFE, EFSANE Û BAWERIYÊN ERDNÎGARÎ Û DÎROKÊ

Em berê xwe bidin zanyarî, felsefe, efsane û baweriyên erdnîgarî û dîroka xwe, em dikarin der barê çawa zanista hevjiyanê bikin de daneyan kom bikin.

Di raboriya vê erdnîgariyê de, ji gelek aliyan ve mirov dikare perspektîfên ji îro zanatir û mirovî bibîne. Her wiha, dema ku em li ser vê raboriyê radiwestin, em dibînin ku têgehkirina "qada taybet û giştî" ya ku nûjentiya sermiyandar afirandiye û xebitandiye, çi qas sexte û bêbingeh e.

Ji ber ku weke îro, di tevahiya dîrokê de jî civak û dewletan, bi rêya efsane, ol, zanist û felsefeyê, teşe dane hevjiyanan.

Destwerdan kirine û sînor danîne. Qada taybet; a rastî, her tim bûye qada giştî, bi giştî hatiye nîqaşkirin û diyarkirin. Di efsaneyan de têkiliyên di navbera xweda û xwedawendan, bi zimanekî helbestî hatiye vegotin. Di efsaneyên demên destpêkê de, ziman helbestî be jî, çîroka dilşewat a li gel xwedawenda li ser text tenê rûniştiye, gav bi gav bav, kur, hevjîn, bira û yar dane rûniştandin.

Piştre van, ew çawa ji textê xwedawendîtiyê daxistine, di malên deare de kirine laşfiroş (fahîşe) û di malên taybet de kirine pîrek, heye.

Em dikarin van çîrokan, ji pergalên hevjiyaniyê ên ku çawa daxistine hevjiyanên koletî û efendîtiyê û bûne mehkûm jî bixwînin. Ev dezgehên efsaneyê bi zimanekî helbestî vedibêje. Di heman demê de ji Hamûrabî dest pê dike û dibe çavkaniya îlhama dadnasiya împaratoriyên beriya zayînê hatine nivîsîn jî. Ev dadnasî, cihê jinê yê di nava malbat û civakê de têkiliya jin û mêr, di rewşên destdirêjî û xapandinê de û hwd, sizayê didin jinê. bi awayê li ser hevjiyanan diyarker be, pênase kirine.

## OLÊN YEKXWEDAYÎ

Olên yekxwedayî jî, ji bo pênaseya jin û mêr û rêgezên wê, gelek serwerî danîne. Weke mînak; ola xiristiyaniyê jiyana rahîb û rahîbeyan bingeh girtiye. Têkiliya zayendî, ji kadroyên xwe re qedexe kiriye. Ji civakê re jî li derveyî zarokanînê, hevşabûna ji bo zewqê guneh dîtiye. Pêwîst e, bandorên wan ên li ser jiyana civakî, ji pir aliyan ve werin lêkolînkirin.

**Gelo rê li ber hevjiyana azad vekirin?**

**Gelo astengiyên nû derxistin?**

Divê ev werin lêkolînkirin. Di demên piştre de, nûjentiya sermiyandar, li ser navê azadiya zayendî rê li ber zayendîtiya pir vekiribe, ev li dijî qedexeyan weke bertek pêş ketiye.

Di hevjiyanên bi aloz ên îro em dijîn de, divê bandorên serweriyên xirîstiyan û îslamî bên lêkolînkirin. Di çareseriya ku îslamiyet

dibîne de, zayendîtî guneh, an jî qedexe ye. Lê mêr, di vê mijarê de xwedî mafên bêsînor e. Jin, tenê bi qasî di çarçoveya zagonên olî de hatiye pênasekirin, azad e.

**Îslamê**, ji bo jinê mafên bi gelek mercan daye. Ji van mercan a herî girîng**: "Xweda, li jor çi be, li jêr jî ji bo jinê, hevjînê wê, ew e. Ew çi bêje, ew dibe."**

**Xiristiyantî**, li Rojava û îro li hemû cîhanê serwer be, di çanda zayendîtî û ramyariyan de bandora wê ya dîrokî heye. Her wiha, îslamiyet jî bi heman awayî, li gelek herêmên xwedî şêniyeke girîng, di ramyariyên zayendî de bandor û çewisandineke xwe heye. Kesên dixwazin zanista hevjiyana azad pêş bixin, dikarin destpêkê li ser van daneyan lêkolîn bikin.

**Felsefe û zanistê jî**, ji demên xwe yên destpêkê ve li ser vê mijarê pir serê xwe êşandine.

**Mînak:** felsefeya yewnan a ku çavkaniya felsefeya Rojava ye, teoriyeke wisa çêkirine, mêr tenê ji bo zarokan çêkin, dikarin bi jinê re rakevin. Ji bo zewqa zayendîtî jî, dikarin zarokên kurik hîn kamil nebûne, ji xwe re diyar bikin. "Jin, mêrekî kêm, an jî seqet çêbûye. Ji bo dostaniya mêr ne guncaw e."



Ev hizir, di hemû erdnîgariyên ku ev felsefe lê tên jiyankirin û îlham didin, di seqetkirina hevjiyanên azad de, xwedî berpirsiyariyeke giran e. Ev felsefeya ku jinê biçûk dixe û zayendîtiya bi kurikan re rewa dike, mafê îstîsmara her du zayendan jî dide mêrên gihayî, divê dahûrîneke rexneyî a bi xurtî li ser vê were kirin. Ji ber ku genên çanda "pîrek-kirinê" ya hemû şaristaniyan bandor kiriye, ev ramyaraya zayendîtî ku felsefeya yewnanî rewa kiriye, ava kiriye.

Gelek belgeyên(argumanên) ku cîhana zanista pozîtîfîst çêkirine û pêşkêşî civakê kirine jî, herî kêm bi qasî van sê qadan berpirsiyar in.

**Zanistperestî,** cîhana zanistan a ku bi hişmendiya pozîtîvîst pêş ketiye, di xerabkirina hevjiyanên azad de ji ber rista xwe ya bi aloz û kujer, qadeke ku divê bi serê xwe were lêkolînkirin. Her ku nûjentiya sermiyandar pêş ket û civakîbûn parçe kir, cudahiya di navbera qada giştî û qada taybet de û komkujiyên di nava hevjîniyê ku di encama vê de pêk tên jî, hem pêvajoyên ku divê werin lêkolînkirin, hem jî hesap bê xwestin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di eşqa mirov de mercê bingehîn, çi ye?
2. Çanda desthilatiya baviksalarî, jinê çawa dibîne?
3. Bandora ajoyên zayendî ya bi destên pergalê, çi ye?
4. Ola xiristiyanî; têkiliya jin û mêr, çawa daye rûniştandin?
5. Ola îslamiyetê, çi maf daye jinê? Lêkolîn bikin.

# HEVJIYANA AZAD 2

## SERMIYANDARÎ

Di civakên Ewrûpayê, di dema sermiyandariyê de, bi civaka gund û çandiniyê re malbat û jin jî hatin belavkirin. Sermiyandariya ku pêş ket, mirov hem ji ser axên wan, zeviyên wan û malên wan avêtin û ji malbatê jî dûr xistin.

Ya rastî sermiyandarî, ji bo tekekesiya ku di hevîrê wê de heye, derbasî civakê bike, hetata şaneyên wê civakê jî parçe kir. Ji bo ku mirov û xwezaya wî daxîne asta zindiyên yekşaneyî û yek bi yek li ser wan bandor bike, wisa parçe kir.

**Malbatê**, bi awayê herî zalimane para xwe wergirt.

Bi taybetî, di dema pîşesaziya sermiyandariyê û pêvajoyên piştre de, mirov rewşa malbata li Rojava zanibe, wê demê dikare aşkere bike ku di vê mijarê de çi qasî durû ye. Jineolojiya ku bi armanca zanisteke civakî ya nû ku di zanistên civakî de şoreşê bike, derdikeve. Di lêhûrbûna li ser dîroka hevjiyanan, di vê mijarê de rastiya Rojava û bi taybetî civaknasiya Rojava, çima dixwazin vê veşêrin jî, wê lêkolîn bike.

**Civaknasiya Rojava, heta niha rave nekiriye ku malbat çima û çawa hatiye belavkirin û qedandin? Bangaşeya ku dibêjin; jin, di dema sermiyandariyê de azad bûye, derewek e.** Ji bo ku ev derew were aşkerekirin û beşeke girîng a hevjiyanên hatine tarîkirin, bên ronîkirin, divê ev lêkolîn bi kûrahî û jidilbûneke mezin werin meşandin.

Di têgihîştina kevneşopî de hevjiyan; têkiliya jin û mêr, yan jî yar, evîndar be jî hevjiyan, ne tenê ev e. Di navbera jin û mêr de têkiliya hestiyar û zayendîtî aliyekî vê jiyanê ye. Lê desthilatî, ji bo ku dixwaze bi taybetî vî alî armanc bigire û teşe bidiyê, rastiya di vî alî de dikare mohra xwe li hemû têkiliyan bide. Dema ku pênaseyên jin û mêr, bi civakîbûna ku di nav de ne têkildar û hevbandorî were

pênasekirin, wê pênaseya hevjiyanan bigihêjin wateya xwe ya rastî.

**Ev wate, wê aliyê hest û zayendîtiya bi aloz jî estetîze bike û bigihîne etîkê.**



Hevjiyan, cewhera hemû têkiliyên civakî ye. Di vê qadê de asta hişmendî, hest, ruh, rêzdarî û hezkirinê çi be; ya ku di rastiya civakî de xuya bike jî, wê ew be.

**Mînak:** hevjiyana mêrên li ser desthilatiyê çawa be, dixwazin welat jî wisa bi rê ve bibin. Di jiyana rojane ya mirovên ji rêzê de jî têkiliyên hevjiyanê diyarker in. Mêrek, an jî jinek, di vê qadê de aloz, qeyran, tengaviyeke mezin bijî, hema bêje ne gengaz e ku di têkiliyên xwe yên civakî de kêfxweş be. Mêrek, an jî jineke ku hevjiyaneke aram, azad, serbixwe, birêgez, li gorî pîvanên etîk û estetîk dijî, hema bêje negengaz e ku di qada civakî de bixitime, zordariyê bike û bêçare bimîne.

Hevjiyan, di teşegirtina dewlet, aborî, ol û gelek diyardeyên jiyanî de diyarker e. Ji ber ku ev, ji serî ve bi bandorbûna diyalektîkeke wisa hatiye avakirin.

Abdulah Ocalan dibêje: "Kesên tekekesî, yan jî hevbeş gavê diavêjin, eger têkiliyên jin û mêr di warê zanistî, felsefî û hunerî de bikin bingeh, bi tenê wê demê dikarin ber bi hevjiyana azad ve gava rast biavêjin. Ev gavên pêşî yên bên avêtin, weke ku gelek caran tê bawer kirin, ne gavên ku taybet ên di navbera du kesan de tên avêtine, der barê civaka sosyalîst, demokratîk a bê pêkanîn de gavên pêşî yên gerdûnî ne."

Destgirtina bi zanistî, hunerî û felsefî merc digire.

**Jineolojî, çima divê were pêşxistin? Ev merc, vê jî rave dike.**

Ji bo nêrîna felsefî, zanistî û hunerî ya ku divê ji bo hevjiyanan

were bidestxistin, pêşketina jineolojiyê pêwîst e.

Yek ji armancên bingehîn ên jineolojiyê; wê nezaniya kûr a li ser hevjiyanan hatiye sepandin, ji holê rake. Ev nezanî, îro ji dil li jiyana civakî dide.



Di demên pir dirêj ên dîroka mirovahiyê de, hatiye çespandin ku hevjiyan qirkirina civakê nakin, xwedî hêzeke wisa ne ku civakê mezin û hilberîner dikin. Di mijarên dubendiya jin û mêr, têkilî û hevjiyanên wan de, ji bo aloziya ku heye were derbaskirin, hevjiyana azad; weke pênaseyeke balkêş, aram û razî dike, dixuyê.

Bi angaşta ku ji têkiliyên di navbera ruyên wekhev ên jiyanê, ruhên wekhev ên jiyanê, hebûnên wekhev ên jiyanê de pênase û çareserî bîne, radibe.

Abdulah Ocalan vê qadê, aliyê dualî yê civaka xwezayî, weke: "qada ku divê destpêkê zanista wê were avakirin" destnîşan dike. "Têkiliya hevjiyanê, xwedî taybetiyên wisa ye ku ji binî ve bandorê li têkiliyên civakî û gerdûnî hemûyan dike. Durûtiya herî mezin a şaristaniyê ew e, ev têkiliya gerdûnî bi tenê weke têkiliyeke mahrem a dualî û taybet hesibandiye. Yek ji sedemên bingehîn ku zanîna civaknasî bênirx û bêkêr were hesibandin, ev e.

Zanista ku li dora jinê were pêşdebirin, wê bibe gava pêşî ya ku ber bi civaknasiya rast ve bê avêtin. Tu qada jiyanê, bi qasî qada hevjiyana azad, ne xwedî taybetiya bingehîn û diyarker e. Aborî û dewlet, weke têkiliya bingehîn tên hesibandin û ev hizireke xwecih a civaknasiya nûjentiyê ye."

Hevjiyana azad a ku Abdulah Ocalan wisa bi kurtasî rave dike, xwedî hin rêgezên bingehîn e.

Yek ji armancên teoriya hevjiyana azad; dewlet, aborî, ol


û gelek saziyên civakî, bi şêwazeke ku bikevin xizmeta hevjiyanan werin sererastkirin.

Armanceke wê ya din a girîng; destjêberdana civaknasiya şaş a ku hevjiyanan dixe xizmeta van de. Hevjiyaneke ekolojîk, berdewamkirina nijad û zêdebûnê bingeh nagire, li gorî îdeala (meqbûl) mirovahiya gerdûnî, hebûna zindiyên din ên gerdûnê li ber çavan digire.



## EM DIKARIN, RÊGEZÊN SEREKE YÊN TEORIYA HEVJIYANA AZAD, WISA RÊZ BIKIN:

1. Têkoşîna li hemberî hêzên serdest û desthilatdarperest.
2. Di hemû qadên hişmendî û saziyî de jiholêrakirina jiyana zayendperest a civakî.
3. Redkirina nêzikatiya samanperest a li ser jinê.
4. Dûrxistina jinê ji her tiştî, wek ku bibe amûra berdewamiya nijadê, karkeriya erzan , bêheq, bêkarî û tiştbûnê.
5. Afirandina jina ku di bingeha azadiyê de, tekekesiya xwe pêk tîne.



Ev rêgez, ji bo jin û mêrên ji pêşxistina hevjiyanê bi hev re berpisiyar in, derbasdar in. Hevjiyan, ji teoriyên bingehîn ên gihandina netewa demokratîk û civaka demokratîk e. Wê ji bo jineolojiyê jî bibe qada destpêkê ku lêkolîn bike û zanista wê ava bike.

Armanca zanista jinê: Beriya her tiştî, wê bi naskirin û watedayîna xwezaya jin û mêr jîndar bibe. Ji ber vê sedemê, teoriya hevjiyana azad, wê weke yek ji qadên bingehîn ên jineolojiyê were bipêşxistin.

Jineolojî, dema ku vê qadê bi pêş bixe, di serî de Rojhilata Navîn, têkiliyên jin û mêr ên di çandên gelên cuda de, wê bi narîniyekê vekole.

Dîntiya ku pergala sermiyandar rojane dide jiyankirin, ne rastiyeke xwezayê ye. Her çi qas di çanda pir gelan de hatibe jibîrkirin û li îro pir kêm bandora wê mabe jî di mijara hevjiyanên azad de, kevneşopiyên bingehîn ên îro, em dikarin sûdê jê werbigirin, ezmûnên girîng jê derxin û moralê xwe pê xurt bikin, hene. Di nirxandin û destgirtina wekheviya jin û mêr, rêzdariya ji hev re, qadên berpirsiyarî û karbeşiyên hevbeş de misoger li pêşiya zanistên civakî yên îro, civaknasî û zanista demografyayê ne.

Jineolojî, di vî warî de, çandên Kurdistanî, hevjiyanên azad çawa pênase kirine û çawa jiyane, wê bide ber lêkolînên berfireh. Di vê mijarê de, çandeke din a ku divê bi baldarî were lêkolînkirin jî kevneşopiya bikok a Zerdeştiyê ye. Felsefeya têkiliyên jin û mêr ên vê kevneşopiyê, girêdanên vê bi bawerî û çandan re, di roja me de, xwe dana der, di lêgerîna afirandina hevjiyanên azad de ji çavkaniyên ku wê serî lê were dayîn. Lêkolînkirina komên cuda, kî dizane dibe ku li qeraxên nehatine kifşkirin dijîn, girîng e ji bo ku ezberên me yên di mijara hevjiyanên azad de bişikînin.

# JINEOLOJÎ

✱ Jineolojî, wê li ser têkiliyên jin û mêr û hevjiyanên azad, deriyên ezmûnên pir dewlemend ên li Rojhilata Navîn veke.

✱ Jineolojî, wê pirsên têkildarî hevjiyanê, rê û rêbazên derbaskirinê, bi jin û mêran re di qadên civakî de bigire rojeva xwe û nîqaş bike.

✱ Her wiha jineolojî, di nava malbatê de rewşa zarokan a heyî û asta ku divê bistîne jî, pêwîst e ji nîqaşê re veke.

Ji ber ku lêgerîn, hewldan û têkoşînên di vê mijarê de li ser rêgezên saxlem û hevgirtî dewam nakin, aloziyên hevjiyanan qat bi



SERDESTIYA ZILAMÊ SERWER

qat dewam dikin û gefan li tevahî xwezaya civakî dixwin.

Ger mirov, li koletiya ku di têkiliyên jin û mêr de tê jiyîn binêre û derfetên azadbûna di vê qadê de, ji nedîtî werin hesêb, dîsa pirsgirêk, nayê derbaskirin.

Ev derfetên azadiyê, çi ne?

Cotên xwezaya civakî, ger di mercên pir zehmet ên xwezayê de jiyana civakî bi hev re ava kiribin û dabin jiyankirin, îro jî dikarin têkiliyên jin û mêr bi awayekî azad, wekhev û demokrat, ava bikin û bijîn.

Ji ber vê yekê, divê hem jin û hem jî mêr, xwe azad bikin. Heta ev bi pêş nekeve, ne tekekes baş û qenc dibin, ne jî di navbera jin û mêr de, têkiliyên baş ên hevjiyanê bi pêş dikevin. Ne jî di warên azadiya civakî û ramyarî de, ristên saxlem dikarin bigirin. Heta dubendiya (mêrê serwer - jina kole) neyê derbaskirin, têkoşînên azadiyê jî nikarin serkeftî bibin. Heger hişmendiya ku têkiliya saman û desthilatdariyê li ser jinê disepîne were derbaskirin, jin jî di nava dîroka dirêj a vê têkiliyê de, hînbûnên hizirî û hestiyarî yên wergirtiye, derbas bike, dikare têkiliya jin û mêrên azad pêk were.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Armancên teoriya hevjiyana azad, çi ne?
2. Rêgezên sereke yên hevjiyana azad, rêz bike.
3. Nêzîkatiya Zerdeşt ji jinê re, çawa bû? Lêkolîn bikin.
4. Bi mamosteya xwe re li ser hizira hevjiyana azad û zayendperestiya civakî, hevsengiyekê çêbikin.

WANE 3

## AVAKIRINA RONAKBÛNA JINÊ

"Jin, di xwezaya civakî de, hem bi fîzîkî hem jî bi rewanî beşa herî fireh digire.

Heger wisa be, çima ev parçeyê xwezaya civakî ya pir girîng, nabe mijara zanistê?



Heta ku xwezaya jinê di tarîtiyê de bimîne, wê hemû xwezaya civakê jî di tarîtiyê de bimîne. Ronîbûna berfireh û rast a xwezaya civakî, tenê bi berfirehî û rasteqînî bi ronîbûna xwezaya jinê gengaz e. Ji dîroka mêtîngehbûna jinê, heta aborî, civakî, ramayrî û mêtingehkirina hişmendî, cihê wê ronî bibe, wê tevkariyeke mezin bide hemû mijarên din ên dîrokê û civaka rojane bi her aliyê xwe ve, ronî bibe. "Ev nirxandinên Abdulah Ocalan ne û ji aliyekî din ve, bersiva "pirsa çima jineolojî?" dide.

Beriya her tiştî, armanca jineolojî, ronîkirina rastiya jinê ya heyî ye. Rastiya jinê, qadeke ku hatiye tarîkirin û di tarîtiyê de hatiye hiştin. Ji bo ku di tarîtiyê de bimîne, karên qirêj û tarî hatine kirin. Ji bo ku ev qad were ronîkirin, mirov roniyên lewaz, parçeyî, demdemî, belav û xweber biavêje ser, têrê nakin.

Tarîtiya pergalê ya ku rastiya jinê tê de hatiye hiştin, li hemberî berdewamî û biryardariya vê, li gorî êrîşkariya wê, heta ronîbûneke jinê ya ji wê jî derbas bike, pêwîst e. Lê kombûna şewqa ronahiya jinê, kûrahiya wê, bipergalbûna wê, armancgirtin û berdewamiya wê, pêwîs in.

Ev ronî, wê zanibe kengî, çawa, li ku derê, li kîjan alî û bi kîjan kurahiyê bide?

Wê zanibe kîjan tarîtiyê ronî bike, çi qas û çawa bimîne?

Bi tarîtiyê re şerê xwe, tarîtiya xwe û berdewamiya wê zanibe. Ya herî girîng, wê çavkaniyên tarîtî û roniyê zanibe. Di sedsala 21'ê de li ser nasname û jiyana jinê, tarîtî û karên qirêj tên sepandin. Divê li hemberî van tarîtiyan, cîhana jinaniyê, bi destên jinê, hiş jinê, giyan û sehekên jinê, dîroka jinê bê ronîkirin. Ji ber vê yekê, pêdivî bi şewqa jinê heye.

Lingekî vê tarîtiyê: Hestên jinê yên baweriyê yên xurt hatine îstîsmarkirin û bi olperestiyê ve hatiye girêdan.

Lingekî din: Hesta welatparêziya jinê bi dewletperestî û neteweperestiyê ve hatiye îstîsmarkirin û bi dewletperestî û netewperestiyê ve hatiye girêdan.


Lingekî din jî: Potansiyela(imkan) mejiyê jinê yê xurt, li dibistanan hatiye rawstandin, ber bi pozîtîvîzm û zanistperestiyê ve hatiye herikandin û wisa hatiye girêdan.

Lingê dawiyê jî: Cîhana hestan a jinê ku bi qasî rojê dewlemend û germ e, bi hezar û yek awayî di bin navê eşq, fedekarî, dayîktî, hezkirinê de hatiye îstîsmarkirin û bi vî awayî hatiye girêdan. Xwezaya jinê, cîhana wê û gelek qadên tarîtiyê yên li ser nasnameya wê hatine avakirin, mirov dikare rêz bike.

Divê hemû jin zanibin ku ev ling, yek bi yek çawa hatine avakirin, çîroka wê ya dîrokî û rojane çawa tê çêkirin û afirandin. Kengî jin bikevin ferqa zanîna vê, wê ev lingên tarî qut bibin. Ji bo ku jin der barê xwe de, xwedî agahî û zanîn bin, xweşiya vê bijîn û bi vê re cîhanên tarîtiyê yên li ser wan hatine avakirin, hilweşînin.

# TEORIYEKE ZANÎNÊ YA GIHANDINA PÊKHATINA CIVAKA AZAD Û TEKEKESA/Ê AZAD

Her ku avabûnên hizirî yên bi efsane, felsefe, ol û zanistê hatin çêkirin, têgihîştineke wisa serwer e, zanîn û zanyarî di yekdestiya mêr de ye. Vedîtin û afirîneriya cewherî ya mêr e.



Ji dema ku desthilatdariya mêrê serdest hat damezirandin ve, bi alîkarî û teşedayîna bêsînor a van çar qadên hizir, zanîn û zanyarî ji jinê û jin ji zanînê hat dûrxistin. Ji bo ku jin negihêjin zanyarî, zanist, zanîn û bi taybetî zanatî û jin careke din negihêjin hev, efsaneyên kuştina dayîkê jî weke qehremantî pêşkêş kirin.

Olan, jin kirin hevalên xerabiyê.

Felsefeyê, bi gotina "bêaqil", jin biçûk dît.

Zanistê, bi qasî ku hebûna wê, bi dîsîplîneke bigire dest û lêkolîn bike jî, ji mirovan nehesiband.

Weke ku jin, koleya mêtingeha destpêkê û ya herî kevn e, heta hetayî weke hemû azadiyên wê, mafên wê yên zanînê, kirina karê zanyariyê û bi zanînê re eleqedarbûn jî şewitandibûn. Di nava bermahiyên şoreşa neolîtîkê ya ku jinê afirandiye de, bingor kiribûn.

Bingeha desthilatdariyê, zanîn, zanist û zanatiya ku hatiye dizîn e. Piştî pênc hezar salî, ev tê nîqaşkirin. Ev heqîqeteke weke mircanê çespandin dike: Aqilê mêrê desthilatperest, tevî hemû qurnazî, dek û dolabên xwe jî, li hemberî jîrekiya jinê ya hestiyar têk çûye. Ji ber ku li gel ev qas hewldan, nikariye jinê asteng bike ku dîsa bigihêje zanînê û zanîn bi jîrekiya jinê re, bigihêje hev.

Zanîn, û zanista ku diziye û zanyariya ku xwestiye tune bike, li çavkaniya xwe vedigere. Jineolojî, ji bo bîreweriya hemû jinên sêhrkar, zanyar ên bi hezarê salan tên kuştin, Ji bo ev veger, etîk û estetîk pêk were û ji nû ve bigihêje hemû civakê.

Di teoriya zanînê de, felsefeyên ku lîberalîzmê derbas nakin, rexne dike. Di vê mijarê de, li ser xebatên akademî ên ku dibin alîkar û şûngirên femînîzmê û nûjentiya sermiyandar, lêhûrbûnan dike. Di asta akademî de, hilberandina zanînê girîng dibîne. Heta ku bi azadî, serxwebûn, jîrekiya jinê, xwezaya jinê, ji qenciya jin û civakê re be.

Jineolojî, di her qada jiyana civakî de, ji bo bigihêje zanîn û hişmendiya rast, pêşxistina epîstemolojiyeke nû armanc digire. Dema vê dike, destpêkê dîrokên zanist û avaniyên zanînê digire dest û nîqaş dike. Ji ber ku jineolojî, ji bo epîstemolojiyên hene, yên ku ji jiyana civakî re nabin bersiv û dixitimînin derbas bike, pêş dikeve.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima pêwîstî bi ronakbûna jinê heye?
2. Qadên tarîtiyê yên li ser nasnameya jinê, binirxîne.
3. Çima desthilatdariya mêr, efsaneyên kuştina dayîkê pêşkêş kir?
4. Aqilê mêrê desthilatperest yê têk çûye, binirxîne.

WANE 4

## ŞOREŞA DI ZANISTÊN CIVAKÎ DE


Pêşniyarkirin, avakirin û pêşxistina jineolojiyê ya bi tena serê xwe li ser zanistên civakî, rexneyek û destlêwerdanek e. Ger ku ji aliyê pênase, nêrîn, avaniyên zanînê, awayên zanîn û lêkolînê û rêbazên wê ve xwe rast birêxistin bike û bibe civakî, wê di derbaskirina aloziya ku îro zanistên civakî dijî de, bibe hêza çareseriyê. Bi jiyana ku wê li derdora jinê pêş bikeve re, divê mirov heyirî nemîne ku wê li derdora jineolojiyê, zanista civakî pêş bikeve.

## TÊKILIYA JINEOLOJÎ Û ZANISTÊN CIVAKÎ



Di zanistên civakî de şoreş, vebûn û nûbûna ku pêwîstî pê heye, Jineolojî bi xwe ye. Di qada zanistî de veguherîna bingehîn a pêkhatina wê jêneger e. Îro, bi aqilê mêrê desthilatdar pêkhatina wê ji ber gelek sedeman, pir zehmet e. Koka tevahiya zanistan civakî ye, civakîbûn e, ango afirîneriya jinê ye. Ew zanist, zanîn û zanatiya ku bi destên jinê, bi giyan, dil û hezkirina wê, dikare li asoyên din vebe. Cîhanên din kifş bike û bide kifşkirin. Dikare di dogmayan de, zidankirin ji çarenûsê derxîne û sînoran bêwate bike. Jineolojî, weke zanisteke civakî, wê namzeta pêşketinê be û tevahî tevgerên jinê yên ku têkoşîna azadî û demokrasiyê didin, wê xwe bispêrin wê.

"Di van demên dîrokê de, gelek kar dikevin ser milên zanista civakî û sincî. Zanisteke civakî ku ji yekdestiya desthilatdarî û zanînê derketiye, diwêre zanista xwe ava bike û di derketina ji aloziyê ya ji bo çareseriyên berhemdar de jiyanî be. Ji bo avabûna civakeke demokratîktir ji hêla azadiya zayend û ekolojiyê ve, destpêkê pêwîstî bi avabûna zanisteke civakî heye.



Tiştên ku em dixwazin bikin, pêşnûmeyeke bingehîn û heyecana vî karî ye." Di vê nirxandinê de Abdulah Ocalan pênaseya "ji yekdestiya desthilatî û zanînê derketiye û diwêre zanista xwe ava bike" dike. Jin, ew beşa civakî ya ku wê bi hêjayî û cewherî, vê pênaseyê bigire ser milê xwe. Ji ber ku di sedsala 21'ê de, ya herî zêde bindesta desthilatdariyê ye, jin e. Jin, dikare hêza wêrekiya avakirina zanista xwe, ji dîroka xwe werbigire, ji ber ku jinê vedîtina gelek tiştên destpêkê kiriye û van jî mirovahî û civak pêk anîne. Ji ber van her du pênaseyan, dibetiya ku zanista jinê, zanistên civakî yên navborî pêş bixe, pir xurt e. Beşên ku ji bo derketina ji qeyranê, çareseriyên berhemdar bi dildarî û jêhatî pêşkêş bikin, wê jin bin.

Jineolojî, li ser qada zanistên civakî, weke destwerdaneke hişmendiyê ya pir xurt a ku bi lênêrîna jinê were kirin e. Em dikarin bi nêrîneke giştî ji jineolojiyê re bêjin, "cudabûna hişmendiyeke di hemû qadên zanistên civakî de ye". Destpêkê divê di qada zanistên civakî de, xwedî hêza dahûrandinekê be. Zanista civakî ya ku bi taybetî bûye keleha herî xurt a pozîtîvîzm û lîberalîzmê, heger bi nêrîna jinê, bi rexneyeke bingehîn were rexnekirin û nirxandin, wê bibe xebata herî bingehîn a jineolojiyê.

Gelek dîsîplînên zanistên civakî, bi têkçûnê (îflasê) dikevin sedsala 21′ê. Di rewşeke ji jiyana civakî ya ku navê wê wergirtiye dûr, qut, biyanî û dijmin de ne. Jineolojî, kîjan mijara zanistên civakî bigire dest, pêşî divê ji vê rastiya zanistên civakî hesap bipirse û têkoşîneke rast bide. Îro di zanistên civakî de, mijara jinê, pirsgirêk û tevgerên wê, hema bêje di asteke tune û kêm de, tê destgirtin.

Berpirsê vê yê bingehîn kî ye?

Bêguman, şaristaniya ku bi desthilatiya mêr û avaniyên wê yên zanîn û desthilatiyê ne. Vegotina bîrdoziya mêrane, mohra xwe li tevahî zanistan û zanistên civakî xistiye. Der barê jinê de gotinên derewîn û xemilandî ne. Ev jî, ji bo tawanên ku pênc hezar sal li dijî jinê tên kirin veşêrin, pêwîst in. Ji ber vê yekê bi kar tînin. Lê di jiyanê de, rewşa jinê ya rastî cuda ye. Di afirandina vê de, pareke girîng a zanistên civakî heye. Jineolojî ji bo ev par aşkere bike.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Jineolojiya li ser qada civakî, binirxîne.

2. Bandora civaknasiya zihniyeta ku desthilatdaran daye avakirin. Lêkolîn bike.

WANE 5

# PÊŞXISTINA RÊBAZA LÊKOLÎNEKE LI GORÎ RASTIYA JINÊ

Jineolojî, ji bo pêşxistina rêbazên lêkolînê yên li gorî jinê û bikevin xizmeta pêşketina hizir û çalakiyên azadiyê ye.

Abdulah Ocalan bi vê mijarê ve giredayî, wisa dibêje: "Di çareserkirina pirsgirêkên civakî de, li ser diyardeya jinê lêhûrbûn, hewldanên wekhevî û azadiyê di ser jiyana jinê re çavkanîkirin, divê hem bibe rêbaza bingehîn a lêkolînê, hem jî bingeha hewldanên estetîk û etîkê, zanistên hevgirtî be. Rêbaza lêkolîneke ji rastiya jinê bêpar, têkoşîneke wekhevî û azadiyê ku jinê neke navenda xwe, nikare bigihêje heqîqetê û wekhevî û azadiyê bi dest bixe."

"Rêbaza lêkolîneke ji rastiya jinê bêpar" çi ye? Heger Wisa be, "rêbaza lêkolîneke ku rastiya jinê tê de ye" çi ye?

Bersiva mirovekî zanyar ê pozîtîvîst bide we, zelal e: "Hin rêgez û rêzikên diyar ên rêbaza lêkolînê hene, têkiliya van a bi jin, an jî mêr re tune, divê em bi zanistî bihizirin!" Lê her mirovê aqil di serê wî/ê de heye, dipejirîne ku di hemû bobelatên hatine serê mirovahiyê de, rastiya rêbaza lêkolînê ya jin bêpar û mehrûm hiştiye, heye.

Dema ku em qala bêparhiştina jinê ya ji lêkolînan dikin, ev nayê wê wateyê ku jinan di lêkolînan de cih girtine, yan na. Lêkolînên ji rastiya jinê bêpar, nirx û hebûna jinê, cihê wê yê di dîroka civakî de, hevbandoriya di têkiliyên jin û mêr de û ji gelek aliyan ve, bi tunehesibandina jinê re pêwendîdar in. Mînakên vê, şênber tên ber çavên me: Rahibên Sumerî û Mezopotamya, Platon û Yûnanîstan, Franscis Bacon, Ewrûpa û Nêçîra sêhrkaran.

Rêbazên lêkolînan li gorî jinê, di çarçoveya jinê de wê çi bin?

Bersiva destpêkê ya ku em didin vê pirsê, jineolojî wê tenê xwe nespêre rêbazeke xwecih. Bersiva ku vê pirsê diyar bike, bi pênase û saziyên mê û desthilatperest ên hişmendiya baviksalarî ku li ser rastiya jinê tên sepandin re têkildar e.

Jineolojî, wê rêbazên ku van derbas bikin, aşkere bikin û vebijarkan ava bikin, hilbijêre. Tu carî ji bîr nake ku rêbazên hatine avakirin, bi giranî mohrên aqilê mêrê serdest hildigirin. Li hemberî vê rastiyê, her tim pêşxistina şiyariya hişmendî, weke rêgezên bingehîn dipejirîne. Wê di lêgerîna rêbazên xwe de, pêşxistina şîroveyên piralî, weke rêbazeke hêza wateyê dewlemend dike û kûr dike, dinirxîne.

Kifşkirin û pêşxistina rêbazên ku dogmatîzmê bişikînin, karibin ji pirsgirêkan re bibin hêza çareseriyê û wêrekiya hizirî teşwîq dikin, bingeh digire. Her wiha dema ku rêbazên xwe diyar dike, têkiliya mirov û civakê nêzî heqîqetê dadihûrîne, lêkolînkirina civaka mirov û taybetiya mirov a xwedî karaktereke metafizîk e, her tim li ber çavan digire û tevlî hizira "mirov, bê metafizîk nabe" dibe. Hewl dide vê hizirê, bi tevahî hişmendiyên ew rawestandiye, ji nû ve bide qezenckirin. Efsane, ol, felsefe , zanist, sinc, her cureyên hunerê, ramyarî û teknîka hilberînê, xwedî taybetiyên metafizîk in. Vê hizirê dipejirîne û di lêkolînên xwe de, rêbazan pêş dixe.


Ew, di mijara rêbazê de, xebitîna diyalektîkê di her mijarê de, li ber çavan digire. Tevlî hizira ku dibêje; dualîte, dijîtî yan jî her du seriyên hev du tune dikin, dînamîka avabûn û pêşketinê ji vê tunekirinê çêdibe, nabe. Di rêgezên gerdûn û xwezaya civakî de, rêbaza tez, antîtez û sentezê guncawtir dibîne.

Dualîteya ku di her pêkhateya gerdûnê de heye, têkilî û bandora wan a bi hev re dinirxîne û wisa wate dide guherîn û pêşketinan. Dubendiyên weke: gerdûnperestî li gorî xwebûnî û herêmperestiyê bi narînî digire dest. Bi ferqa xeteriyên ku tê de, nêzikaty pêş dixe, rû bi rû ye. Ew bi wê armanca ku bibe zanista jiyana civakî. Li gorî xwebûnê, weke rê û rêbaza bi qasî hejmara mirovan li serikan

şîrove nake. Aşkere ye ku gerdûnîperestiyê jî, weke rêgezperestiya gerdûnî ya naguhere, pêşketina rast li ser xetekê nagire dest û berevojî nake.

## REXNEYA LI ZANISTÊN POZÎTÎVÎST

Jineolojî, jihevcudakirina obje û sûbjeyê ya ku mohra xwe li rêbazên zanistên pozîtîvîst xistiye, bi rexneyî digire dest. Rêbazên ku xwe dispêre hişmendiyeke ji vê cudakirinê, derbas dike. Rêbaza Descart ya ku ji hev cudakirina obje û sûbjeyê pêş dixe û dike felsefeya bingehîn, napejirîne.



Çespandina ku fizîka kûantûmê kiriye, jihevcudakirina obje (bireser) û subjeyê (kirde) nayê teqezkirin. Jineolojî, vê rastiyê bingeh digire. Asoyên nû yên ku kûantûmê li pêşberî me vekirine (fizîka pêlan û perçekên jêratomê, bisehekî, pergalên bi hilbijartina azad, di heman demê de bûna du tiştên cuda, tu carî nederbaskirina rêzika nediyariyê), wê di van asoyan de, li diyardeyên ku lêdikole û vedikole, binêre.

Bi nermî, azadî, piralî, dewlemendî, cudahî, curbicurî, potansiyel û dibêtiyên guherîna xwezaya civakî dizane. Di lêkolîn û

vekolînên xwe de rêbaza kûantûmî bingeh digire.

Jineolojî, hişmendiya xwezaya zindî bingeh digire û wisa nêzî xwezayê dibe. Bi vê nêzikatiya felsefî û hîskirina sehekî armanc dike ku zanista ekolojiyê pêş bixe. Di bingeha van rêgezên sereke de, bi jîrekiya jinê ya azad û sehekî yên taybet bi jinê, awayên hizirîna efsaneyî, olî, felsefî, zanistî û rêbazên ku bi kar anîne, lêkolîn dike.

Aliyên wan ên erênî û neyînî bi hev re dinirxîne. Ji van rêbazên ku kes û civaka azad bi pêş bixe, sûdê werdigire. Tu rêbazan tenê bi aliyên wan ên erênî, yan jî neyînî, nake weke pût, an jî veder nake. Bi qasî rêbazên olî, efsaneyî, felsefî û zanistî, hişmeniya ku çand, huner û wêjeyê têkilî hev dike, **"hişmendiya armonîk"** bingeh digire.

Ew di lêgerîna rêbazên nû yên ku rejîma heqîqet û zanînê de, dihûne. Lê di vê lêgerîna xwe de, hizir û hişmendiyan, weke olî û li derveyî olê, dabeş nake. Hewl dide bersiv û beramberiyên civakî yên cureyên zanînên efsaneyî, olî, felsefî û zanistî, watedar bike. Her yekê ji wan, bi dahûrînên civaknasiyî digire dest.

Li gel rêgez, an jî hişmendiyên rêbazên giştî ku diyar dike û xwecih, nagire dest, li gorî xweseriyên her zanista di çarçoveya wê de, wê di nava lêgerîna rêbazê de be. Dema ku jineolojî rêbazên xwe yên lêkolînê bi pêş dixe, yek ji diyardeyên pêwîst e lê baldar be jî taybetiyên cihê lêkolînê ye. Cihên destpêkê û pêşketinê yên jineolojiyê, bi tena serê xwe, bi qasî ezberên giştî yên hişmendiya zanista klasîk, li ser têgihîştina cihê hîn bûye jî helwest û rexneyeke berfireh e. Ew, weke di pêvajoyên ku zanist çawa bi dest û hişê jinê çêbûye, hemû qadên jiyana civakî, ji bo pêşketinê weke cihekî dipejirîne û wisa bi pêş dikeve. Tenê zanîngeh, akademî û enstîtuyên lêkolînê yên fermî, weke cihên lêkolîna bingehîn nabîne. Bawer dike ku lêgerîn û pêşketin, azweriya zanistî, divê her dem giyanê amator, hewesdar, bi gotineke din wijdan hilgire.

Ji bo zanist, bi civaka sincî û ramyar re bi eşq û hezkirin, bi danehev û nirxên mirov, bi aliyê metafizîk ên mirov û heqîqetê re girêdana xwe winda neke û ji sûda civakê dûr nekeve, hilbijartina cihên lêkolînê pir girîng e.

## BANDORA ZANISTÊ

Zanist, ji bo ku li ser civakê (weke di şerên cîhanê û bi taybetî pêvajoyên piştre, hatiye jiyankirin) di sazîbûna yekdestiyên çewisandin û mêtingeriyê de neyê bikaranîn, divê azadî û nasnameya xwe biparêze û her dem bi pêş ve bibe. Divê rêgezên hilbijartin û pêşxistina cihên lêkolînê, ji bo karakterê zanistê yê azad û ji civakê re bisûd be, bi pêş bixe, alîkar be û karê wê hêsan bike.

Korîtiya derbarê jinê de bi qasî parçekirina atomê zehmet be jî, divê jin bişikîne, yê ku atom parçe kiribû jî mirov bû. Wî mirovî jî bê sînor piştgirî, aqil û hêz ji jinekê wergirt. Her çi qas li xwe mikur neyê jî ango di parçekirina atomê de, para jinê jî heye.

Wisa be jin, çima korîtiya li derdora jinê parçe neke?

Her wiha, dema ku jin lêkolînên jineolojiyê bi pêş bixin, wê para xwe di ew qas kûrbûna wê koriyê de jî bibîne. Jineolojî, ji bo ku jin bibînin, werin dîtin, werin xuyakirin û xwe nîşanî çavên kor bidin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Lêkolînên ji rastiya jinê bêpar in, çi ne?
2. Çima jineolojî rêbaza Descart, bingeh girt?
3. Têgeha Kûantûmê, çi wateyê dide?
4. Bingehên ku jineolojî digire dest, çi ne?
5. Bersiva jineolojiyê ya li hemberî korîtiya derbarê jinê de, binirxîne.

WANE 6

# "SERHILDANA MÊTINGEHA HERÎ KEVN" BIGIHÎNIN SERFIRAZIYÊ

Ji bo ku mirov karibe jineolojiyê, bi têkiliya wê ya bi femînîzmê re bigire dest û nîqaş bike, Abdulah Ocalan dibêje: "Tevgera femînîstê, bêguman divê bibe tevgera herî radîkal a dijberî pergalê. Ji bo ku nûjentiya demokratîk van bike, hêmana xwe ya jêneger wê bixebite.



Azadî, wekhevî û demokrasiya jinê; xebatên teorîk ên berfireh, têkoşînên bîrdozî, xebatên bernameyî û rêxistinî, ya girîngtir jî çalakiyên xurt, pêwîst dike.

Bêyî van xebatên femînîzm û jinê, ji xebatên lîberal ên dixwazin bêhna pergalê derxin wêdetir, wateyekê hilnagirin. Wateya têgeha femînîzmê, bi kurdî jinperestî ye.

Ev ji bo pênasekirineke tam a pirsgirêka jinê, kêm e. Dijberî vê, ji ber ku weke mêrperestî tê nasandin, dikare ber bi bêşensiyê ve bibe. Wateyeke weke jina bindest a mêrê serdest dide der. Bêguman, zanista jinê, femînîzmê jî digire nava xwe. Jineolojî, alîkariyê pêşkêşî femînîzmê jî dike. Tevgera azadî, wekhevî û demokrasiyê ya jinê ku xwe dispêre vê zanistê, zelal e ku di çareseriya pirsgirêkan de, wê bi rista sereke rabe."

## FAMÎNÎZIM

Femînîzm, di dîroka jinê ya nêz de xeleka berxwedan û ronîbûneke pir hêja ye. Bi taybet, di têkoşînên civakî, avaniyên zanînê û şêwazên jiyana jinan ên di sedsala dawî de dînamîkeke girîng bû. Bi hemû nirx û derfetan, pê re ye, hîn jî wisa ye. Tevgerên femînîst, tenê pirsgirêka jinê nedan xuyakirin. Tenê di çarekirina vê pirsgirêkê de hin ramyar çênekirin. Di heman demê de, nîqaşkirina pirsgirêka ekolojiyê, desthilatdarî, nûjentî, zanista zayendperest, awayên zanîna mêr, teoriyên xwe dispêrin hişmendiya kartezyen, hişmendiyên dîrokê û di rexnekirina gelek mijaran de, tevkarî û alîkariyên pir girîng ên tevgerên femînîst çêbûne. Ji ber van sedeman, xitimînên tevgerên femînîst ku diviyabû tevgereke herî radîkal a dijberî pergalê be û ew ji hewcedariyên civakî re nebûne bersiv, di sedemên pêşxistina jineolojiyê de sereke ne. Ji ber ku xitimîna femînîzmê, di têkoşîna li dijî pergalên desthilatperest de, bêbandor mayîna eniyeke girîng e. Jineolojî, ji ber vê sedemê, femînîzma ku serhildana jinên mêtingeha destpêk û dawiyê ye, ji bo ji etîketên nûjentiya sermiyandar were safîkirin û bigihêje nirxên xwe yên dawî ye.

Her wiha, ji bo bersiva pirsa;

"tevî ev qas hevbeşiyan, çima ev qas bêrêxistinî?"




Jineolojî di warê teorî û jiyanî de were dayîn.

Mijarên teorî, pratîk û rêxistina femînîst yên ku jineolojî wan ,rexne dikin, hene. Ev mijarên rexneyê, di heman demê de, bi sedema pêşketina jineolojiyê jî ji nêz ve têkildar in.

# XALÊN REXNEYAN ÊN BINGEHÎN, JI BO FAMÎNÎZMÊ




1. Di rewşa heyî de li dijî nûjentiya sermiyandar û zanistên wê, şêwazên jiyan û hizirên wê, femînîzm, ne di nava dijberiyeke pergalê ya radîkal de ye. Tevgerên femînîstê, bi helwestên xwe yên heyî, nikarin ji lîberalîzmê qut bibin û bibin hêzên dijberî pergalê.

2. Teoriya femînîst, tevî ku rexneyên girîng li ser nûjeniya sermiyandar dikin, nikarin nêrîna pozîtîvîst û rojhilatnasiyê bi awayekî ku têrê bike, derbas bikin.

3. Femînîzm, veder dimîne, nikare bibe civakî. Tevî zanînên mezin ên ku afirandine, di guherîn û veguherîna civakî de, bi rist û berpirsiyariya xwe ranabe.

4. Ne di nerîna civakan, ne jî di nerîna pergalên dewletperest û desthilatperest de, weke "tevgera sereke ya vebijark e", bêhtir weke tevgerên hêviyê tên dîtin.

5. Hin tevgerên femînîst dibêjin: **"Erka femînîzmê ne rêxistinkirin e, femînîzm hizir diafirîne, hinekên din dikarin pêk bînin.**

” Hizirên; rêxistinkirina civakê, civak serwextkirin, curekî endezyariya civakî ye, diparêzin. Ji ber vê yekê, ji bo têkoşîna azadiya jinan, kadroyan ava nake.

6. Hîn jî nikarin asoyên demokrasiyên ku navenda wan Rojavaye, derbas bikin.




7. Cihekî weke pozîtîvîzma jinê dan femînîzmê, vê li ser hev sepandin, mirov nikare hemû nirxên jinê bi navê femînîzmê diyar bike.

8. Jinan, bi hezarên salan ezmûn û ceribandinên xwe, li gorî xwecihiyên xwe jiyane û bi nav kirine. Hin tevgerên femînîst, tenê li aliyekî van mercên xweser ên ceribandinên jinan dinerin û nav lê dikin. Ji hinekan re dibêje, femînîzma post-kolonyal, femînîzma rengîn, femînîzma kurd, femînîzma îslamî û hwd, lê ji bîr dike ku beşeke girîng ji jinan, ev ceribandin jiyane û di cih de nabînin ku bi van navan werin nasandin.

9. Di gihiştina heqîqetên azadiyê yên bingehîn de, destgirtina pirsgirêkên civakî bi yekpareyî girîng e. Femînîzmê nekaribû vê destgirtina yekpareyî bi ser bixe.

10. Femînîzmê, di hişmendiya têkoşînê de, dahûrînên

akademiyî dike û vê dike navenda xwe. Lê tevî vê jî di jiyanê de teng dimîne. Di destgirtina pirsgirêka jinê de, mirov dikare bêje, hatiye parçekirin, bêrêxistin e, zemînên hevbeşiyê bi piranî winda kiriye û ji her cure hevbeşî û rêxistinbûnê direve. Ev jî yek ji pirsgirêkên dijwar ên femînîzmê ne ku teorî û jiyanê ji hev qut dike.

11. Di wêjeya (lîteratura) femînîst de, dahûrînên rexneyî yên hişmendiya mêrê desthilatdar tê kirin. Lê çareseriyê, tenê bi serwextkirin û zanakirina jinê sînordar e. Guherîn û veguherîna mêr, zanebûna zayend û azadiyê dayîna wan, bi qasî di azadiya civakî de rista xwe bilîzin, rêxistinkirina wan, di berpirsiyariya xwe de nabîne. Li ser vê qadê, nîqaşên bi wêrekî, rexneyên berfireh pêş xistiye. Lê di mijara hevjiyana azad de destkeftiyên femînîzmê, nebûne ramyarayeke zayendiyê ku ya pergalê derbas bike. Azadiya zayendiyê, takekesî girtiye dest.

12. Di vê qonaxêde femînîzm, di dîtina kêmasiyên xwe û pejirandina wan de, di nava kevneperestiyê de ye.

## LI HEMBERÎ REXNEYÊN FAMÎNIST ÇAREKIRIN

Tevgera azadiya jinên Kurdistanê, pirsgirêka jinê, çareya wê û nirxên jinê afirandine yên ku femînîzmê ew derxistine holê û dane xuyakirin, lêkolîn dike.

Her wiha, nirxên têkoşîna jinên ji Rojhilata Navîn, Efrîka, Emerîkaya Latînî, Rojhilata Dûr û gelek jinên ji çandên din, dane hev û ceribandinên wan jî bi têkiliyeke mezin, lêkolîn dike. Bi dahûrîna ceribandinên xwe jî wê jineolojiyê, weke zanista avakirina hebûna jinê, pênasekirin û berdewamkirinê pêş bixe.



Jina Berxwedêr Şehîd Bêrîtan

Ji ber ku hebûna jinê, civakî ye, ev zanist wê di heman demê de zanista jiyana civakî jî bihûne.

Ev pêvajoya avakirinê, di heman demê de wê bibe pêvajoya ku femînîzm ji bandor û sînorên pergala serdestiyê were paqijkirin. Pergala azadiya jinê ya vebijêrk jî were avakirin. Jineolojî, derketineke nû ye û her derketinek vebijêrkek e. Zanista jinê ku ji aliyê berfirehî û cewher ve, wê bibe bersiva vê sedsalê, di heman demê de wê weke zanista jinê jî pêş bikeve. Divê jineolojî, Ji bo ku li derdora jinê azadiya civakî ava bibe û were birêxistinkirin, demarên femînîzmê yên veder dimînin û dixitimin, veke.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Femînîzmê, bi sê pêlên wê ve binirxîne.
2. Femînîzmê, di dîroka jinê ya nêz de, lêkolîn bikin.
3. Pênc mijarên femînîzmê yên teorî û pratîkî yên ku jineolojî, rexne kirine, binirxînin.
4. Lêkolînên ku tevgera azadiya jinên Kurdistanê dikin, çi ne?

WANE 7

# GIRÎNGIYA PARASTINA CEWHERÎ JI BO JINÊ

Jineolojî, ji bo xwe parastina jinê ya ku hatiye şkandin û lewazkirin, were xurtkirin û kes nikaribe têk bibe dixebite. Dibe ku ji beriya her tiştî, jineolojî weke zanista xwe parastinê were têgihiştin.

Di giştî xwezayê de sazûmaniyên xweparastin û hişmendiya wan jixweber in. Ev di jinanê de, ji destpêka dîrokê ve pir xurt bûye. Her ku derbarê xwezaya wan de serwextiya wan hatiye lewazkirin, xweparastina wan birînên xedar wergirtine. Ev pêvajo, wisa bi xwezayî çênebûne.

Jinan, jixweber, bi sernermî û koletî serî netewandine. Li gel şerên dijwar, bi amûrên zora bîrdozî û xapandinê, hatine pêşxistin. Jin, êdî ne aydî xwe, ne aydî civaka xwe, ne jî aydî xweza û gerdûnê bûn. Gav bi gav ji van hatin dûrxistin. Bi awayên cur bi cur neçarî biyanîbûna ji xwe hatine kirin.

Biyanîbûn bixwe, jixwe hilweşandineke xweparastin û qirkirina wê ye. Her ku ev biyanîbûn pir û kûr bû, jin ji xwe dûr ketin. Parastina jina kole û radestbûyî, wisa hatiye avakirin. Li dijî mêrê efendî û serdest, desthilatdarî, dewlet û tevahî çekên wan, pir lewaz û bêrêxistin bûn. Jin jî weke gelan, , bi kedxwariya hişmendî, ango bi radestbûna bîrdozî,  ji kedxwariyê re vekirî dihatin hiştin.

Jin, xwedî derfet, serwextî û bertekên pir xurt ên xweparastinê ne. Ev ji xwezayê wergirtine. Ji ber kedxwariya hişmendî, di jinê de, li hemberî baweriya bi xwe, ev potansiyel hemû pûç kirine û lewazbûnek mezin hatiye pêkanîn. Ev jî, yek ji xalên ku xweparastin tê de şkestiye. Li ser vî bingehî, jineolojî, ji aliyê dîrokî û rojane ve, xalên şikestina xweparastinê, lêkolîn dike.

Hişmendiya xweparastinê ya jinê, bertek û ruhê wê, kengî, li

ku derê û bi kîjan rêbazan, hatye şkandin?

Vê şikestinê, cîhana civaka jin û mêr çawa birîndar kir?

Gelo ev şikandin, wê weke çarenûsekê berdewam bike?

Jin, wê hişmendî, bertek û ruhê xweparastinê ya rewa, çawa ji nû ve bi dest bixe?

Jineolojî, di vî warî de wê bikeve pey gelek pirsên din.

Xweparastin, ji bo jinan pirsgirêkeke jiyanî û lezgîn e. Di sedsala 21'ê de jin li bazaran weke koleyan tên firotin. Koletiya zayîndî û hwd, tê kirin.

**Wek mînaka sedsala 21'ê dema ku çeteyên Daiş êrîşên xwe yên qirêj birin ser Şengalê, jin û zarokên Şengalê li bazarên koleyan hatin firotin û tecawizkirin.**



Jin, ji aliyê mêr an jî malbatê ve tên kuştin. Her wiha di şeran de jî tê kuştin û koçberkirin, bi birçûbûnê tên perwerdekirin, bi erzanî tên xebitandin û hwd. Êşkenceyên ku bi wateya mirovbûnê re nakok in, ji bo rewa tên dîtin.

Sedema vê ya herî bingehîn, şkestina sazgêrî xweparastinê yên jin û civakê ne. Ji bo ku ev mekanîzma, ji nû ve û bi saxlemî werin avakirin, hişmendiyeke xurt a jinê girîng e. Bi pêşxistin zanista jinê ya ku dîroka jin û civakê, rastiya civakê digire nava xwe, girîng e.

Avakirina hişmendiya jinê û jineolojiyê, xwe parastinek e. Di xwezayê de her zindî xwe ji metersiyan diparêze. Wek teoriya gulê dema ku mirov ji bo xweşiya xwe gulekê jêke gul bi stirên xwe, xwe diparêze. Ji ber vê yekê, beriya her tiştî divê jin, têgeh, teorî û saziyên xwe yên cehwerî û hizirî ava bike. Ne tenê di warê fizîkî, di warê zanistî û hizirî de jî xweparastin pêwîst e. Abdulah Ocalan bi gotina: "Bobelateke bi qasî windakirina xweparastinê ya civakê mezin, nayê hizirîn.

Netew dewletê, civak ji zanist, huner û heqîqetê dûr xistibe û bêyî xweparastin hiştibe, ev yek ji hêmanên herî bingehîn ên pirsgirêka civakî ne." Bi balkêşî vê mijarê nîşan dike.

Jin jî, di her qada ku bibînin civak û jin tê de bê xweparastin hatine hiştin, dikarin bi huner, heqîqet û dorfirehiya zanista jinê, dest bavêje jinê. Di nava hişmendiya xweparastinê de, jineolojî dikare bi ser hemû qadên ku civakê ji civakîbûnê derdixe de, biçe. Derketinên vebijêrk, çare û çareyên berfireh bi pêş bixe.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima pêwîst e jineolojî, weke zanista xweparastinê were têgihiştin?

2. Çima di giştî xwezayê de sazûmaniyên xweparastin û hişmendiya jinan, jixweber in?

3. Jinê, çi ji xwezayê wergirtiye?


4. Jin, di sedsala 21'ê de rastî çi hatiye? Lêkolîn bikin.

WANE 8

# JIN, TA DAWIYÊ HEYÎNEKE NIRXDAR E

Ji nirxandinên Ramyarê civaknasiya azadiyê Abdulah Ocalan:

“Min her tim bawer kir ku, jiyan û dostaniya li derdora jina bi çalakiya azadiyê jidayîkbûye, dê jiyan û dostaniya herî xweşik be. Ji vê qet gumanên min çênebûn. Di vê mijarê de ez tevlihev nebûm. Li şûna ol û civaka bi desthilatdariya zilam, min wateyeke mezin da hişmendiya ol û civakîbûna bi giraniya jina xwedawend a wekheviyê bingeh digire. Ji bo ku ev yek pêk were, min karkeriyeke mezin a azadiya jinê û evînê meşand.



Min, jin weke beşeke cuda ya gel nirxand. Ne weke xwediyê wan, weke hunermendek, ji seknek xweşik a fizîkî bigire, ta bûna çirûskek jîriyê, bi dengê zimanê xwe bi qasî ku tu heyber wê tamê nede, xwegihandina astekî bi xweşikî, min li ser her tişta wan destlêwerdan kir. Hinek kesên rezîl, ji ber nasnameya jinê rast ji hev dernexistibûn û nepejirandibûn, ev nêzîkatî û xebat şaş dinirxandin. Dema ku jin, an jî keç dihat gotin, her tim têkiliyên zayendî yên çors û erzan dihatin bîra wan. Lê bi her alî ve di xebatên jinan de, ez bêhtir li girîngiya rastî, heqîqeta dîrokî û civakî haydar dibûm. Ew, ji bo min cewhera civaknasiyê bûn.

Keç jî, bi coş û zêde diherikîn, dihatin. Min cara pêşî ew bi anor û rûmet hembêz dikirin. Her wiha, me bi hev re dilîst û carinan min ew datanîn ser milên xwe. Min şerma jinê bi erdê re dikir yek û her ku min di kesayeta wan de didît jiyana azad pêk tê, jiyan

bêhtir watedar û xweşiktir dibû. Li qada xwe, her çi qas tengbû jî, min sazûmaniya hiyarerşîk a li ser wan xerab dikir. Tiştên mirov ji vê hîn dibûn, mirov nedikarî ji hezaran pirtûkan hîn bibûya. Platforma têkiliyan a ku min bi wan re danîbû, statuya mêrê serwer a di çarçoveya pîrek û zilam de hatibû danîn, parçe parçe dikir. Ya rastî, ez bêhtir jî bi parçe parçebûna vê statuyê bextewar dibûm. Her ku diçû, derdiket holê ku ew ne objeyeke zayendî ne, mirovên hêja ne û bi vê yekê em serbilind dibûn. Vê nêzîkatiyê, rê li ber hezkirinê bi xwe vedikir. Min dixwest ez hem mêr, hem jî bi taybetî jinê, bi heyîna wan û azadiya wan a rastî ya mirovî bihesînim, mirovbûna wan bi wan bidim naskirin. Ev, ezmûneke mezin a navxweyî ya şoreşgertiyê bû.

Min bi baweriya ku dê rojekê misoger bibin jinên ku karibin zilamên zordest bînin rê, ta dawiyê hewldanên xwe domand. Ji bo ku em bersiva hesretên wan bidin, hema bêje min her roj xwe ji nû ve afirand. Lê ji ber ku min nekarîbû bersivê bidim, tim bi êş û janbûm.

Heqîqeta herî girîng a ez dixwazim ew bizanin ew e ku, divê bi qasî karibin çarenûsa şer jî, aştiyê jî diyar bikin, xwe bi hêz bikin. Pir hat îstîsmarkirin, pir xerab hat bikaranîn, kirin destikê bi sedan xapandinan. Lê dîsa jî, jinên delal û zîrek, jinên bi destên xwe egîd bi van xebatan derketin holê.



Me keçên gelek bedew û jîr şehîd dan. Ez ê ji wan re nebêjim qehremanên bênav, ew qehremanên rastîn bûn. Eger jiyaneke civakî ya mirov pê re hebe, bi tenê bi dilsoziya bi bîranînên wan û bi meşa li ber ronahiya wan a rênîşaner re dibe. Dê her yek ji wan, weke xwedawendeke dilêr, ezîzeyekê ya van xakan û gelê me bên bibîranîn. Min ji bo hemû derdorên peywendîdar xwest nîşan bidim ku şervaniya jinê, ne tiştekê ku ji rêzê ve bê destgirtin e.

Bi kurtî, ez gihiştim vê encamê: Rastî, bedewî û qenciya xwedayî ya li cem jinê bibîne û pê re bijî!

Pir hindik be jî, me ji vê jiyanê para xwe wergirt, me parve kir û me jiyan kir. Ez ji wan hînbûm ku jin ta dawiyê heyîneke nirxdar e. Ya bi wan re hat jiyankirin, dibe ji nû ve qezenckirina nasnameya welatê hatiye windakirin û qezenckirina nasnameya min a azadiyê bû. Bêguman e ku, bi qasî ew wate bidinê û pêdiviyê pê bibînin, ez ê wan im û ez ê her tim wisa bimînim.”

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**“Dema ku jin, an jî keç dihat gotin, her tim têkiliyên zayendî yên çors û erzan dihatin bîra wan”.** Li ser vê hevokê mijarekê binivîsin.

# ŞEHÎD SAKINE CANSIZ (Ş. SARA)

Di sala 1958'an de li Dêrsmê ji dayîk bûye (Bakurê kurdistanê).

Ew keça Dêrsimê ye ku dewlet û desthilatî nas nedikir. Ji ber rastiya Dêrsimê ya civakî bi deh hezarên salan di giyanê civakîbûnê û hezkirina azadî, mirovahî û xwezayê de, avakirî ma. Lê piştî ku lêkolîn li ser Dêrsimê kir û naskir ku di sala 1938'an de, li dijî wan komkujiyek pêkhatibû, wê dewlet û desthilatdarî xweş nas kir.

Ş. Sara dibêje: Jiyana min timî di nava şer de bû.

Jiyana xwe di nava lêgerîn û lêpirsînê de qedand. Ji ber ku malbata wê nijadperestên Tirkiyeyê bûn, nakokî bi wê re çêdibû. van nakokiyan hişt ku li hemberî dewlet û pergala heyî serî rake. Ji bo parastina baweriyên xwe yên hizirî û belavkirina wan û ji bo baweriyên xwe bi gel bide nasîn, **wê berxwedaniya xwe wek kesê ku bîrekê bi derziyê bikole dikir.**



Di dema xwendina xwe ya zanîngehê de girûpên şoreşgerî nas dike û tevlî tevgera azadiya gel dibe. Ew yek ji jinên ku di dema damezrandina PKK'ê di sala 1978'an de, amade bû.

Keça navê wê yê tevgerî Sara ye, sûnd xweriye ku bibe dengê azadiyê ji bo jinên ku bi destê zarodestan dibin kole, piştî ku H. Sara ket zindana Amedê (Diyarbekirê), deh salan berxweda xwe ya li himberî zindaneke ku bi hovîtiyê tê naskirin nîşan da û serê xwe qet netewand.

Bi rêyên îşkenceyên herî dijwar, nidikarîbûn dilê wê yê tijî jandarî binpê bikin. Piştî deh salan derdikeve û li Lubnanê li geliyê Bîqa'ê perwerde dibe û diçe Ewropayê. Li wir jî karê rêxistinî dide meşandin.

Li paytexta Fransayê, Parîsê bi reşkujiyekê di 9 Rêbendana 2013'an de, bi du hevalên jin, Fîdan Doxan û Leyla Şaylemez re, bi destê Interbol yan (Mîtê) Tirkiyeyê, tên şehîd xistin.

Weke girûpekê li ser jiyana Heval Barîn Kobanê û hevalên ku bala we dikşînin, hîn berfirehtir lêkolîn bikin.


# BEŞA 3

## NERÎNA JINEOLOJÎ LI SER ZANIST Û REHENDÊN CIVAKÎ

1. Etîk û estetîk
2. Aborî
3. Demografya
4. Ekolojî
5. Dîrok
6. Tenduristî
7. Perwerde
8. Polîtîka

WANE 1

# ETÎK Û ESTETÎK



**Estetîk** bi Yewnanî (Aisthesis) tê wateya tiştên em fêm dikin û hîs dikin. Weke giştî zanista xweşkbûnê tê naskirin.

**Etîk** (Ethos) tê wateya zanista sincê (exlaq).

**Etîk û estetîk:** pîvanên jiyanê ne.

Hemû qadên ku weke qadên jineolojiyê tên ravekirin, jiyanî ne. Êdî li cîhanê, tevahî lîstokên desthilatiyê û çarenûsên civakan, di ser van qadan re tên diyarkirin. Weke zanista jin û jiyanê, jineolojî jî wê van qadan bi lênerîna jinê bigire dest. Tevlîbûna xwezaya jinê û tevgera azadiya jinê, wê ji bo pêvajoya nûjeniya demokratîk bide çêkirin.

Zanisteke jinê ye ku karibe bibe vebijêrk, her beşê alîgirên demokratîkbûn û azadbûna civakê tevlî bike û van tevlîbûnan, veguherîne vîna demokratîk û çalakiyê. Di kêlî û qadên ku pêwîstiya jiyana heye, zanisteke jinê ya ku karibe xwe nû bike, dikare çewisandin û kedxwariya li ser civakê kêm bike û bide sekinandin, bêyî ku zanistperestiyê bike, dikare zanistê weke hizir, xebat û wijdana hevbeş a civakê pêş bixe.

Feylesofê îranî Shihabaldin Suhrawardy ku lêgerîna heqîqetê bi canê xwe ve daye, dema gotiye; “Mirov, bedewiyê nîşanî yê ne pispor bide, zilm e.” felsefeya xwe ya bedewiyê weke hêzeke tenê zanîn û serwextî dikare rake û têbigihêje, dibîne.

Suhrawardi, di cewher de têkiliya bedewî, zanîn û serwextiyê

vegotiye. Dema ku gotiye bedewiya bi zanabûnê hatiye afirandin, divê bi kê re û çawa were parvekirin? Di heman demê de balê dikişîne ser etîkê jî.

Ev gotina zanyarî ya hezar sal beriya roja me hatiye gotin, ji me re vedibêje ku bedewî nabe karê her kesî. Ji bo ku mirov karibe bedewiyê hilgire, divê serwext û zana be. Mirova/ê zana bibe, bigihêje rêgeza "xwe zanibe", ew mirov e ku serweriya dogma û pêşdaraziyên di hişmendiya xwe de hilweşîne, ango mirova/ê azad bibe. Ya/ê azad bibe, jixwe bedew e.

Divê were zanîn ku estetîka her jinekê ku bêje ez girêdayî xwe me.

Abdulah Ocalan jî di dahûrînên ku tevahiya dîroka têkoşîna me de kirine, têgehên estetîk, bedewî, kirêtî, xweşik-nexweşik her dem bi kar aniye. Her dem estetîk bi asta azadiya jiyan û têkiliyan re girtiye dest. Di demên ku gelê kurd di bin êrîşên herî dijwar ên dijmin de bû jî, bi têkoşerên xwe û gelê kurd felsefeya "erdema (dilpakiya) herî mezin, dema ku şer dikin jî xweşik mayîn e" da pejirandin.

Ocalan, ji destpêka têkoşînê ta roja me, şer, ramyarî, rêxistinbûn spart rêgezên girîng ên etîk û estetîkê ku armanca hemûyan afirandina kesa/ê azad, civaka azad e.

Bi gotineke din eger xweşikbûn neyê parastin dibe para êrîşan.

Di heman demê de, ev weke divêtiyeke sosyalîstbûnê girt dest. "Bedewî hunerek e. Sosyalîstek, şert e vî alî jî bi pêş bixe. Ger wisa nebe, wê ber bi şêwaza serdest û kedxwaran ve biçe. Ger kesek nikare vê pêk bîne, kesayetek sosyalîst bi dest nexe, ya xerabtir, jina ew hînî stûxwariyê kiribin, bipejirîne, wê ev wî tehdît bike" Ocalan, di vê destnîşankirina xwe de di pêkanîna hunera bedewiyê de, rista berxwedan û neşibandina pergalê rave dike.

Dema ku dest bi têkoşînê kiriye, hemû taybetiyên ne xweşik ên gelê kurd, bi dahûrînên civaknasiyê ve girtiye dest. Rave kiriye ku ev encama qutkirina ji cewhera xwe, ji herikîna xwe ya xwezayî

û ji rewşa xwe ya çandî ye. Felsefeya, rakirina ev qas taybetiyên ne xweşik, tenê bi şerê azadiyê wê bê dayîn, ava kiriye.

"Azadbûn, xweşikbûn e, xweşikî tenê bi têkoşîneke dijwar a li dijî nexweşikiyê tê bidestxistin"



Ev bendeke, di heman demê de sêhra têkoşîna me ya çil salî ye. Di navenda vê sêhrê de têkoşîna azadiya jinê heye ku koletiya jinê li hemberî nexweşikiyê daye destpêkirin. Ji ber ku di dîroka Rojhilata Navîn de xweşikî jî û nexweşikî jî di çarçoveya jinê de hatiye afirandin.

**Mînak: Berê hebûna herî xweşik û pak jin e çi tevbigere yan jî bike, lê ji bo ku jinê li ber çavan reş bikin, gotin: "jina sêhrkar e, jinawir e û jiyanê berovajî dike."**

**Xwezayîbûna jiyanê:** Li ser wekheviya jin û mêr û yekparebûna diyalektîkê hatiye avakirin. Jiyana ji vê diyalektîkê qut bibe, ne xweşik e. Li Rojhilata Navîn, bi hezarên salan e ku jin ji jiyanê hatiye derxistin. Li her devera cîhana me ya ku serdestiya sermiyandar lê serwer kirine, jin kirine "torta (mirdik) jiyanê." Mêraniya jiyanê, bi vê torta jiyanê re pejirandiye jî, kirêtiya jiyanê ta binî biriye. Ji ber vê sedemê, şerê herî watedar, ev kirêtî dîtin, hestkirin, pênasekirin û li dijî wê têkoşîn kirin e. Ev jî, mijara estetîkê ye, ango zanista bedewiyê ye.

## Zanista bedewiyê

**Bedewî:** bi qasî ku bi kozmetîkê, emeliyata estetîkê, cil û bergan, xeml û xişran ve neyê bidestxistin, buha ye. Bi dayîna berdêlên herî mezin tê bidestxistin. Jineolojiya ku weke zanista jiyanê pêş

dikeve, yek ji armancên wê yên herî bingehîn, zanabûna xweşikiyê û daneheva ku wê afirandiye, pênasekirin, şerê jiholêrakirina kirêtiyê û afirandina jina bedew û jiyana bedew e. Gelek tevgerên felsefeyê, hewl dane ku estetîkê, ango teoriya bedewiyê pênase bikin.

**Estetîk:** Di tevahiya pênaseyan de her tim bi etîkê re di nava têkiliyekê de ye. Weke cotekî ji hev qut nabe, hatiye destgirtin. Diyardeyeke, divê baş û rast be ji bo ku bedew be. Hefer mirov di roja me de, bi hişmendiya bedewiyê ya ku li ser civakan hatiye sepandin, binere,





xwedawendên ku bipeykerên xwe heta îro hatine, weke jinên nexweşik ên xwedî bedeneke qelew û nelihev wê bên nirxandin. Lê ew jinên qelew ên ku peykerên wan çêkirine, ji bo civakê, karên civakê mezin bikin û berdewam bikin kifş kirine, rêxistin kirine. Teşeya civakî ya jiyanê ava kirine. Ji ber vê yekê, etîk û estetîk in. Sembola bedewiyeke jinê ya pir xurt in. Ev rista ku jinê di demeke pir dirêj a dîroka civakî de girtiye ser xwe, rojane bibe, wê azadî û demokratîkbûna civakê jî pêk were. Tam jî ji ber vê rista stratejîk, etîk, yek ji qadên bingehîn ên zanista jinê ye. Bêguman etîk bi estetîkê re di nava girêdaneke xurt de ye.

Di zanista etîkê de rêgezeke girîng: Di ferqa wê rastiya "zanîna bêwijdan û ruh dikuje" de bûyîn e. Di civaka xwezayî de çavkanî, kêrhatî û armanca her zanînê hebû, bi civakî dihat jiyîn. Ev rastî, rastiyeke ku bi qasî aliyê estetîkê yê jiyanê, aliyê etîkê jî diafirand.

Îro hiş, jîrekî û mejiyê mirov, her kêliyê di bin êrîşên nûjentiya sermiyandar de teşe digire. Ev êrîş, bi rêya perwerde, dibistan, dê û bavên ku di pergala sermiyandar de teşe digirin û înternetê tên pêkanîn. Zanîna bêwijdan tê empozekirin (bi darê zorê dana pejirandin)

û ruh tê kuştin.

✱ Nifşên ku nizanin zanîna çi û ji bo çi qezenc dikin, bêgiyan dibin.

✱ Nifşên bêwijdan dibin, tên gihandin.

Ev, civaka sincî ji bo çi hildiweşe, sedema wê ya herî bingehîn çi ye? Çalakî û tawana pergala sermiyandar a 300 salî ye.

Astengkirina vê tawanê, teşhîrkirin û destûr nedayîna wê ku mejiyên nû û ciwan bikuje, di qada etîkê de ye. Erka herî mezin a sincê ye.

Jineolojî, dema ku bi vê tawanê re têdikoşe, çanda gelan ji bo ku girêdayî sinca civaka xwezayî bin û li ber xwe didin, bingeh digire. Di vê mijarê de masîvanên qeraxên Kolombiyayê ji bo "zimanê rastiyê dibêjin" tesewir bikin, biwêjek derxistine "Sentîpensante", ango têgeha bi hiskirinê ve hizirîn, pir girîng e.

Her wiha, sinca duayeke Çermesoran "Ruhê mezin! Der barê yekî ku ez di pêlavên wî de du hefteyan negeriyabim de min ji darazdayînê biparêze!" pir girîng e. Efsaneyên Rojhilata Navîn, belgeyên wan ên tesewifî, kevneşopiya devkî, kesayetên mezin jî çavkaniyên gel ên girîng in, wê hişmendiya me ya etîkê jê xwedî bibe. Civakeke bê etîk nikare hebe. Jineolojî, vê zanabûnê bingeh digire û ji hînbûnên jiyan û hizirî yên pergala sermiyandar a dixwaze vê rastiyê hilweşîne berdana bêdawî, weke rêgezeke bingehîn a jiyana azad pêş dixe.

Ew, divê bibe zemîna hevbeş a hişmendiya zanista nû, yekparebûna nav zanistan û hevbeşiyê jî. Xerca wê ya ji bo vê hevbeşiyê, an jî hemû qadên xebatê yên pêş bikevin û wan li gel hev bigire; etîk û estetîk e. Jineolojî, nakeve tu têkoşîn û projeya civakî ya tu etîk û estetîka wê tune be.

Her tim desthilatdarî estetîkê di asta xweşikbûna fîzîka jinê de pênase dikin wekî mînak:

Ji bo ku estetîkê bi hişmendiya zilam bidin meşandin û pê jinê lewaz bikin da ku her tim alîkariyê ji zilam bixwaze. Mînak: Li Çînê

di sedsala 10’an de, ji bo kêfxweşiya zilam û kevneşopiyê û ji bo ku jin ji zewacê re amade be, hiştin ku lingê jinê ji zaroktiyê ve were girêdan; demekê bi awayê zîvirandina tiliyên ling jibin û bi awayekî hişk girê didan, ji bo pîvana estetîkê derbas nekin (dirêjahiya ling, bibe 10 sm).



Bi vê girêdanê jinan pir êş dikşandin û digihîşt asta ku nikarin bimeşin, divyabû hinek alîkariya wan bikin, ew alîkar jî zilam e.

Di roja me de sermyandariyê bi navê estetîkê ji bo jinê pîvan danîne holê, mînak: nişdariyên estetîkê yên destlêwerdana fîzîkî, dirêjbûn, zeyfbûn û hwd, ji bo ku zilam bipejirîne.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Nêrîna Shihab Al din Suhrawardi ya li ser lêgerîna heqîqetê û felsefeya bedewiyê, çi ye?

2. Çima bedewî, nabe karê her kesî?

3. Bedewî, çawa tê bidestxistin?


4. Estetîk çi ye?

5. Di roja me ya îro de estetîk çawa tê pênasekirin? Wek girup lêkolîn bikin û bi mînakên jiyanî  dewlwmend bikin.

WANE 2

# ABORÎ

Aborî bi latînî ekonomis, eko mal e û nomis qanûn e yanî qanûna malê.



Dema ku em dibêjin aborî pere, beng, fayîde, pîşesazî û hwd, tên bîra me, lê tu têkiliya wan bi aboriyê re tune ye.

Mirov ji bo ku debara xwe bike, pêdiviya wî bi hin tiştên wek xwarin û vexwarinê heye. Ekonomis (qanûna malê) cudahiya wê, ji pere, beng û hwd yên ku qanûna malê xirab kiriye, heye. tê zanîn ya ku di malê de van karan dike jin e. Dema jin li derveyî aboriyê ma, pirsgirêka aborî dest pê kir.

Pênaseya ku ji aboriyê re hatiye pênasekirin dibêjin çavkaniyên cîhanê bisînor in û pêwîstiyên mirovan bêsînor in zanistên ku pêwîstiyên mirovan ên bêsînor bi çavkaniyên cîhanê yên bisînor re, bi rêxistin dikin, dibêjin: "Mirov çavbirçî ne, ji bo xwarin û vexarinê hemû çavkaniyên cîhanê talan dikin. Ji ber vê yekê divê zanist baş rêxistin bike ku mirov vê cîhanê talan neke. Li vir du şaşîtî hene, di mirov de şaştî heye û di pênaseya cîhanê de jî şaşîtî heye. cîhanê wek çavkaniyekê dinirxînin. Di civaka xwezayî de watedayîna mirov û watedayîna jiyanê hebû, cîhan wek dayîka xwe didîtin, xwe jî wek zarokeke/î û parçeyek ji wê, dinirxand. Lê di sîstema sermiyandar de, cîhan ne wek dayîkekê dibîne, weke depoyeke locistîkê ye ku dikare her tiştên wê çiqasî talan bike, dibîne. Pênasiyeke mirov a şaş di heman demê de, dibin nêzîkatiyek etîkê. Di etîka esmanî de dibêjin mirov çavbirçiye li dû berjewendiyên xwe diçin, ev pênaseyên şaş, di

gelek pirtûkan de, hatine nivîsandin.

Tiştên ku cîhanê dizîvirîne û pêşketinê ava dike çi ye?



Dibêjin ku mirov li dû berjewendiyên xwe diçe, pêşketin çêdibe. Ewqas pênaseyên şaş ji miruovan re hatine kirin.

Di pênasêya aboriyê de jî dema ew nêzîkatî tê diyarkirin, mirov dibîne li gorî wan piroje û nêzîkatî pêş dikevin. Di her serdemekê de hin tiştên aborî derdikevin pêş mînak: Di serdema neolotîkê de çandinî girêdayî wê şivantî, bazirganî û ber bi bîşesaziyê ve diçe. Bi vî awayî di amûrên aboriyê de, pir guhertin çêdibin.

Li vir pirsgirêk li ku derê derdikevin?

Di teoriyên aboriyê de dewlemendiyên dewletê derdikevin pêş. mînak: Ji bo dewlemendiya dewletê, her sal erdê diçînin, ji ber vê yekê erd lawaz dibe û dibe biyaban.

Teoriyek din a aboriyê dibêje, li ku derê zîv û zîr hebe dewlemendî heye, lê li welatên Ewropa kêm e. Berê xwe didin welatên ku zîv û zêr lê heye. Diçin Afrîkayê talan dikin, zêr û zîvê wan dibin, wan dikujin û wan dikin kole. Bi awayekî hovane semiyana xwe çêdikin û xwe dewlemend dikin.



Teoriyek din ji bo çandinî û pîşesaziyê çêdibe, ji bo dewlemendiya xwe, bi heman awayî nêz dibin. Berovajî kirina aboriyê ji van

kokan dest pê kiriye. Dema teorî yan jî peyv li ser tiştên şaş werin avakirin, di encama wê de, ewqas tiştên xirab bi navê teoriyên aboriyê, tên sazkirin.

Di teoriya aboriyê de, sererastkirin pêwîst e. Ji bo vê yekê Ocalan dibêje pênaseya nirx.

Yanî nirx çi ye?

Çawa were hesabkirin?

Li ser van divê hinekî sererastkirin werin çêkirin. Ji ber ku teoriya nirx bi giranî di sedsala 18'an de ji aliyê David Ricardo (Dêvid Rîkardo) ve nirx wisa hatiye pênasekirin: Nirx dema mirov tiştekî digire û dirûvekî dide wê û kedê xerc dike, nirxê wê bi wê tê



Ocalan vê rexne dike, ji ber ev nêzîkatiyên lîberal û sermiyandar hem jî Marks, bi vê pênaseya aboriyê, nirx jî pênase dikin.

Lê heger ev nirx bê pênasekirin, divê li ser keda dayîkan were pênasekirin. Dayîka ku zarokekî tîne cîhanê, ew zarok mezin dibe, êş û azaran dikşîne, ew dayîk e ya ku kedê dide. Lê li gorî wan hesapdikina keda karkerekî, bi giranî li gorî saetan nirx dê were diyarkirin. Lê heta ev karker gihîşt vî temenî, kê di ber wî de kar kir?



Ew wê çawa were hesapkirin?

Marks û kesên lîberal ji vê kedê re dibêjin keda xwezayî ango ne pêwîst e tevlî aboriyê bikin.

Ji ber ku hesap bikin wê nirxê herî zêde biçe ji dayîkan re. Ji ber vê yekê keda dayîkan weke kedeke neafrîner tê pênase kirin.

Marks dibêje: “ew nekedeke afrîner e, keda afrîner li bazaran tê firotin.” Wan ev nav lêkiriye, Lê divê xwediyê aboriya rast dayîk bin. Ji ber dayîk aboriya rast pêk tînin. Keda din ya cotkaran e, ya din ya şivanan e, ya din ya karmendan e û ya herî dawîyê ya bazirganên biçûk e ku bi pereyên pir kar nake.

Tenê Bi keda van aborî tê sererastkirin...

Mînak: Di demên berê de, mirovan erdên xwe diçandin, berhem li gorî xwe dihiştin û yê din jî difrotin, dewletê ji wan re gotin, em ê ji we bifroşin û sûdê bidin we. Lê dewletê erd û sûd jî xistin bêrîka xwe. Ji ber ku xwediyên erdan nema debar dikirin, erdên xwe ji dewletê re hiştin û berê xwe dan bajaran.

Armanca jineolojiyê aboriyeke rast di bin çavdêriya jinê de ava bikin. Hem jî projeyên nû ava bikin. Ji ber kesê herî pir kedê dide jin e, ked dayîn jî azadî ye.



Jineolojî, qada aboriyê wê bi hin rêgezên bingehîn bigire dest.

Berî her tiştî, wê bi perspektîfa teoriya keda dayîkê ya ku Abdulah Ocalan bi pêş xistiye, li diyardeya kedê binêre.

Bi vê perspektîfê, wê wate û nirx bide keda jinê ya nav malê ku tevgerên jinan bi salan e, têkoşîna wê dikin.

Rêgezeke din, wê gel, bi bawerî aboriya xwe bi xwe, li dijî sermiyandariyê ava bike. Gel, nikarin aboriya xwe di destên sermiyandariyê de, bihêlin. Divê girêdana xebatên aboriyê, bi ax û çandiniyê re hebin. Ji bo vê yekê zemînên herî guncaw, gund in. Pêşxistina xebatên li gundan ,ji bo pêşxistina komînan jî, zemînên guncaw in. Wê pêşketina jineolojiyê di pêşxistina perspektîfa aboriyê de, alîkariyeke pir girîng pêşkêş bike. Her ku qada aboriyê bigihêje perspektîfa jineolojiyê, divê birçîbûn, tunebûn û bêkarî di dîrokê de bimîne. Ji ber ku yên aborî avakirine, jin in.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di mijara aboriyê de rêgeza jinê ya sereke çi ye?

2. Jineolojî, wê çawa rêgezên bingehîn ên qada aboriyê bigire dest?

3. Xebatên aboriyê, çi ne? Binirxînin.

4. Di malê de dayîk ji sibehê heya êvarî kar dike, gelo civak çi nirxê dide wê keda dayîkê. Bi hev re nîqaş bikin.

WANE 3

# DEMOGRAFYA

Demografiya cara yekem wek peyv ji aliyê lêkolînerê firensî Achille Guillard (Îşîl Giyar) hatiye bikaranîn, ew tê wateya şênî.

Peyv Yûnanî ye.

Demos: gel / şênî

Graphe: nivîs / tarîf

Îstatîstîk (Ihsai)

Demografiya wek zanist zêdebûn, koçberî, mirin û hebûnên serjimarê lêkolîn dike.



Di her zindiyên di gerdûnê de zêdebûn, di bingeha xweseriya xwe de, xwedî wate, etîk û estetîkê ye. Bi dozîn û xerîze, yan jî bi jîrekiyekê çêbibe, cewhera wê naguherîne.

Zêdebûneke curbicurî û herdem, yek ji bûyerên razdar ên jiyanê ye. Gerdûn, bi gelek awayan xwe vedibêje.




Xweza, xwedî jîrekiyeke wisa ye ku ji bo zêdebûnê vedoran diafirîne û sînoran datîne. Mirovên civaka xwezayî, berevajî mirovên roja me, bi hezkirin û pîroziyeke mezin nêzî xwezayê dibûn. Xwe weke zarokê/a wê didîtin, li gel wan jî ev sînor hebûn. Lê dema ku dixwestin zarokan çêkin, mercên xwezayê, derfetên xwarin, starbûna klana xwe û yek jî têkiliyên bi klanên cîran re jî li ber çavan digirtin û biryar didan. Di van civakan de dezgeha biryarê ya di vê mijarê de tenê dayîk û jin bûn. Bi deh hezarên salan, bi saya van dayîk û jinên zana, komên mirovan hevsengiya hebûnê bi dest xistin.

Hevsengiya hebûnê, rêgeza zêdebûnê rast û biaqil diyarkirin bû. Ango sînordarkirina ajoya zayendê bû. Dadnasiya dayîkê, ji bo sûda civakê, hemûyan bi rêzikên etîk û estetîk, ve girê dabûn. Wê demê sûda civakê, bi giranî sûda kes bû. Ji ber ku di cewhera civakê de bêdadî tune bû. Mixabin, vê kesayeta civakê, beriya pênc hezar salî dest bi xerabûnê kiriye. Çandeke baviksalarî hat afirandin ku di çêbûna zarokan de bav diyarker bû. Ji bo ku bi zelalî bê zanîn, zarok yê kê ye, jinê di zindaneke, di nava zindanê de digire. Zarok yê kê ye, ji hezkirin û peywendiya ji zarok wêdetir, hêrsa nijada xanedaniyê bi berdewamkirina xwîna “resen,” diyarker bû. Ji hizira xwecih a ku zarokê kurik, wê nijadê berdewam bike û ya dê rastî desthilatiyê werbigire, kirin rêgez û kakilê çanda xanedaniyê ya jêneger. Êdî ya ku ji aliyê desthilatiyê tê teşwîqkirin û piştgirîkirin, her wiha rewa tê dîtin, ev bêçandî bû. Di zêdebûnê de rista yek alî ya mêr hat projekirin û bîrdozîkirin. Ji desthilatiya wî re kirin palpişta bingehîn. Martin Luther, ji kesên bal dikişandin ser metirsiyên cudahiyê, vê bersivê dide: **“Eger jin ji ber zarokanînê bêhal dikevin, yan jî dimirin, tu zirareke vê tune ye. Bihêlin ta ku dimirin, bila zarokan bînin, ji xwe hemû sedema hebûna wan, ev e.”**

Civak û bi taybet jinên ku etîk û estetîka dayîka xwedawend

winda nekirine, heta pêvajoya sermiyandariyê, weke metirsiyeke ew qas mezin, nedihatin dîtin. Ew, dermankerên xwezayî bûn. Civakê, bi bîra xwe ya xwezaya civakî ya bi hêsanî winda nabe, bi xweşbînî li van dinêrî. Lê di dema sermiyana destpêkê ya sermiyandariyê de ev jinên dermanker, wekemetirsiyên herî mezin hatin dîtin. Bi milyonan ji wan bi qirçeqirç hatin şewitandin. Ji ber ku zanyariya tenduristî, pirbûn, plankirina malbatê û pirsgirêkên zayendê û bi taybetî hêza diyarkirina zarokanînê, di destên wan de bûn. Ew zanyariya jinên hatine şewitandin, ji bo ku ji xweliya xwe, ji nû ve xweafirandinê nîşan bidin, demografya di bin banê jineolojiyê de, weke zanist tê pênasekirin.





## RÊGEZ Û XEBATÊN JINEOLOJIYÊ

Karê jineolojiyê yê destpêkê, wê lêkolînkirina xebatên demografyayê yên ku heta niha hatine kirin, be. Di vê mijarê de xala stratejîk, ev e: **"Ev beden a min e, ez ê kengî, li ku derê û ji bo çi di vê bedenê de canekî din hilgirim, ez ê biryar bidim."**

Ev rêgezeke ku wê çarenûsa cîhanê biguherîne. Îro bi milyonan jin, zanyariya ji dema civaka xwezayî, heta sêsed salên dawî derbarê bedena xwe, zayend û zayîna xwe de çêbûn, windakirine û wisa dijîn. Nizanin ku ev zanyarî bi êrîşên efsane, ol, felsefe û zanistên bîrdozî yên mêrên serdest hatine afirandin. Ew zanîna, jin ji bo vê zanyariyê biparêzin, bêhempa li ber xwe dane, ji bîra wan çûye. Îro ev zilma dijwar a mêr, hîn jî li ser bedena jinê tê meşandin. Ji ber vê yekê jî jin derbarê bedena xwe, zayokiya xwe û zayenda xwe de,

ne xwedî agahiyên ku têrê bike. Zanyariya jinên ku karê bijîşkiya xwezayî dikin, dermanker in û heta roja me hatine jî, bi navê "pîrejinan" bêqîmet tên dîtin. Ji ber vê yekê jî zarokanîn, zayendî û bedena jinê, bi temamî ji dada polîtîka û pergala baviksalarî û dewletperest re hatiye hiştin.

Her jin bi sehekên xwe jî be, dizane ku wê bedena wê, karibe çend zarokan bîne

Bedena jinê jî weke tişteke karibe vê zayendiya harbûyî jê zewqê bistîne empoze dike. Ji aliyê din ve ol, jiberkirina zarok û hemû rêbazên kontrolkirina zayînê, qedexe dikin. Ango polîtîkayeke şêniyê ya ku dewlet, ol, desthilatî, hevjîn û bav li ser xwedî maf in, heye. Rewşeke ku yên zarokan di malzaroka xwe de hildigirin, diwelidînin, dimijînin û mezin dikin, vîna wan dişikînin, heye. Di nêzikatiya demografya ya jineolojiyê de **rêgeza din a girîng jî,** jiholêrakirina vê şikandina vînê ye.

**Rêgezeke din a bingehîn,** di tevahiya civakê de hişmendiya berdewamkirina nijadê, ji bûyereke fizîkî wêdetir aliyekî wê yê felsefî jî heye, bi pêş xistine. Çanda xanedaniyê, di rastiya dema me de, bi girêdanên xwînê nayê afirandin.

Bi girêdanên "pereyê fermandar", tê afirandin. Zarokên îro, bi spermekê ber bigirin jî, di malzaroka kîjan dayîkê de neh mehan mezin bûbin jî, her kêlî bi xeteriya bibin zarokên nihîlîzma vê demê re rû bi rû ne. Bi lîberalîzma wê, bêkokiya wê û wehşeta wê re rû bi rû ne.

Dema ku rewş wisa be, mirov dikare dabşa nijada ku tê berdewamkirin bike, an jî doldayîna bênijadkirinê bike.

Di qada demografyayê de, yek ji rêgezên bingehîn a ku wê jineolojî bingeh bigire jî hişmendiya serjimariyê ya Malthus War (Malthûs Warî), dahûrîne, ji civakê re vebêje û li hemberî vê têkoşîneke civakî ya bîrdozî û rêxistinkirî bilind bike. Dê bi tevger û kesên dijberî vê hişmendiya demografyaya vebijark pêş dixin re çalakî û xebatên hevbeş bike. Dijderketineke dê li hemberî lîberalîzm, nijadperestî, antîhumanîzmê, dijminatiya jin, feqîr û bindesya ku Malthus

xwe dispêrê ye, derkeve.

Rêgezên hişmendiya berdewamkirina nijadeke baş xwe bispêrê, ji aliyê jin û zarokan ve diyar dike. Ji bo vê lêkolîn û lêhûrbûn, çêkirina anketên ku ji civakên daneyên şênber kom bike, dahûrandina van daneyan û bipêşxistina tezên hêjayî civaknasiyê û bi vê re hilweşandina qalibên paşverû yên zanista demografyayê û bi hişmendiyeke nû pêkanîna bidestxistina wê, dê bibe bingehên nêzikatiya demografyayê ya jineolojiyê.

Demografya jî weke qadên din ên jineolojiyê, bi hev re di nava têkiliyekê de, tên destgirtin. Felsefeya berdewamkirina nijadê ya şaş û encamên vê, bi abori û ekolojiyê, hemû çavikên civakê, polîtîkayê, qadên tenduristî û perwerdeyê re girêdanên wê yên hişk hene.

**Demografya, bi van zanistan, xwedî dibe, daneyan vediguhêze van zanistan û wan xwedî dike.**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Mirovên civaka xwezayî, kengî biryara zarokanînê, didan?

2. Sedema nebûna bêdadiyê ya di civaka xwezayî de binirxîne.

3. Rêgeza ku wê çarenûsa cîhanê biguherîne, çi ye?

4. Rêgeza bingehîn a hişmendiya berdewamkirina nijadê, binirxîne.

WANE 4

# EKOLOJÎ



Eko: Mal, ered e

Lojî: Zanist e

Weke peyv pênaseya wê hevsengiya di navbera xwezaya yekem û xwezaya duyem de ye.

Xwezaya yekem gerdûn e.

Xwezaya duyem civak e.

Xweza bi xwe peyveke mê ye. Xwe za xwe bi xwe za. Hem jî xwerist xwe bi xwe dirêse. Bi erebî Tabî'a peyveke mê ye. Bi lalînî jî Natura. Ew jî mê ye girêdana dayîkê çêdike.

Ji ber di civakê de destlêwerdana xwezaya duyem çêbûye xwezaya yekem jî ziyan dîtiye, weke mînak qata atmosfer tenikbûye. Ba jî ji ber gemara kargehan û qutkirina daran û hwd, nexweşiyan belav dike

Ekolojî, zanisteke ku xerabiyên di encama serdestiya şaristaniya dewletdar a li ser xwezayê çêbûye û têkiliya civakê ya bi xwezayê re lêkolîn dike. Di civaka xwezayî ya ku li derdora jinê pêş ketiye

de, girêdana civakê ya bi xwezayê re li ser bingehên rêzdariyê ye. Ev girêdan, bi şaristaniya dewletdar re ji holê rabûye. Mirovê bûye biyaniyê xwezayê, bûye biyaniyê xwe, jin û civakê jî.
Ji ber vê sedemê, ekolojî, ji erka pêkanîna derbaskirina nakokiya xwezayê ya bi civakê re berpirsiyar e. Ji bo vê, zanîneke bîrdozî ya xurt û nerîneke zanistî pêwîst dike.

Bi lênerîna jineolojiyê, divê bi aborî, civakî û felsefeyî rêyên yekparebûna bi derdora xwezayê re lêkolîn bike. Ji ber ku pergaleke ku bi xwezayê re nebe yek, ne sincî ye.

Jineolojî, ji tevgereke hawirdorperest a bi tena serê xwe wêdetir, veguherîneke sincî bingeh digire. Tevgereke ekolojiyê ku vê bingeh digire, bi lênerîneke jineolojiyê wê biyanîbûna di navbera jin û xweza, mirov û xwezayê de derbas bike, bingeh digire.



Ekolojî, di vê wateyê de bi qasî qadeke bingehîn a jineolojiyê ye, yek ji kevirên rêya diçe civaka sincî û ramyarî ye. Ahenga jiyana civakî ya bi hêzên xwezayê re jî mijara bingehîn a ekolojiyê ye. Avakirina sincekî di çarçoveya ahenga bi xwezayê re, di heman demê de wê bê wateya herikîna giştî ya jiyana xwezayî û bicihkirina wê ya di civakê de. Di vî warî de nîqaş û çalakiya ekolojîk û jineolojîk, pirsgirêkên wate û avaniyê yên civakê çareser dike. Li rêyên derketina ji qeyranê digere.

Bi jineolojiyê ve pênasekirina pirsgirêkên ekolojîk, dibe bingeha nêzikatiyeke zanistî.

Paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê, li ser vî bingehî, weke di azadiya jinê û çarekirina pirsgirêkên ekolojîk de jî desthilatiya ku çavkaniya van pirsgirêkan e, dadihûrîne.

Rênîşanên çalakiyên jinan ên ekolojî, bi jiholêrakirina xerabûna di civakîbûna mirov de û hilweşîna ku vê di xwezayê de çêkiriye, berpirsiyar e. Dema ku civak bû xwedî nerineke ekolojîk, dê ekolojî bi lênerîneke jineolojiyê li çareseriya pirsgirêkan bigere. Wê karibe bi hevrebûna jîrekiya dahûranî û hestyarî xurtir ava bike û nûjentiya demokratîk jîndar bike.

Diyardeya herî pir ekolojiyê bandor dike jî teknolojî ye. Bi perspektîfeke jineolojiyê, divê yekîneyên ekolojiyê, aborî û teknolojiyê, di hevsengiyeke guncaw de bin. Ji bo vê, li Rojhilata Navîn şoreşa teknolojiyê ya dijpîşesazîtiyê pêwîstiyeke lezgîn e. Ev rêgezên ekolojîk tevahî, dikarin di akademiyan de, werin nîqaşkirin û projekirin.

Jineolojî, hemû beşên civakî yên li bejahiyê dijîn, ciwan, cotkar, şivan û kedkarên di gelek qadên hilberînê de karibin di qadên xwe yên xweser de beşdar bibin, di vî warî de rêxistinkirina akademiyan, weke raveya angaşta di vê mijarê de digire dest.

Ji bo çarekirina pirsgirêkên heyî, divê careke din hevsengiya di navbera xwezaya yekem û  xwezaya duyem de çûbibe.

Mînak: Dar û şînatî tên çandin lê bisaya avakirina kargihên mezin ku bandorê li xwezayê dikin dar, şînatî, av û ba tên qirêjkirin. Ango ji bo avakirina kargehan, daran jêdikin û bijêkirina daran û qirêjkirina ba û avê hevsengiya xwezayê xirab dibe û nexweşî di nav hemû zindiyan de belav dibe.

Bi nêrîna jineolojiyê cihê ku ax lê hebe pêwîste bi dar û şînatî be. Pêwîst e li her malekê şînatî hebin û di heman demê de, di her taxekê de gulîsatan hebin. Divê bi tu awayî av neyê qirêjkirin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Ekolojî, çi ye?

2. Di civaka xwezayî de girêdana civakê ya bi xwezayê re li ser kîjan bingehî bû?

3. Girêdana mirov a bi xwezayê re kengî ji holê rabû û di encamê de, çi hat serê mirovan?

4. Lênerîna jineolojiyê ya li ser ekolojiyê, çi ye?

5. Jineolojî, di qada ekolojiyê de, çi bingeh digire?

WANE 5

# DÎROK

His: Zilam
Tory: Çîroke
Bi latînî History tê wateya çîroka zilam.



Dîrok weke dîroka zilam hatiye nivîsîn. Dîrok du çem in lê ew weke çemekî hatiye nivîsîn, bê jin e. Li gorî jineolojiyê divê ya kevn were derxistin, ne tenê ji bo çîrokên jinan bê nivîsîn, lê mafê wa yê ku di dîrokê de hatiye xwarin, lê vegerînin. Divê bi çavê jinê li dîrok were meyzekirin, dema bi çavê jinê be, wê tiştên baş û pêşketî ferq bike.


Dîrok ne xêzeke rast e û ne jî dubare dibe, di dîrokê de paşketin û pêşketin jî hene.

Dîrok çîroka miriyan vedibêje, ji bo zindî encaman derxînin.

Dîrok, bêtir ji bo jiyaneke watedar pêwîst e. Ya ku wate dide jiyana civakî, hişmendiya dîrokî ye. Ji ber ku bi jineolojiyê nêrîna li dîrokê û bi nirxên ku jin pênase dikin, sererastkirina dîrok girêdanên

dîrokê yên bi jiyan, civak û xwezayê re bi awayekî xurt ava dike.

Em di demeke ku yekparebûna civakî, cih û demî, heta şaneyên wan parçe bûne de, dijîn. Ev yekparebûn, di bin navê zanistê de hatiye parçekirin. Gefan li parvenebûna jiyana civakî ya bi dem û cih re jî dike. Jiyana ku ji rastiya xwe hatiye birîn, banga hawarê dike. Ne tenê di jiyana mirov, di jiyana hemû zindî û nezindiyên xwezayê de, em vê hawarê dibihîsin. Nêzîkatiya ku bi taybetî dîrokê, bi dîtina nivîsê dide destpêkirin û vê dispêre Sumeran, beriya wê beşa ji % 98'ê dîroka civakîbûna mirov a destpêkê jî ji nedîtî ve tê. Bi jineolojiyê, girtina destê jina ku dîroka fermî wê li derve dihêle, çand, sazîbûnên civakî û yekeyan weke kirdeya (subjeya) rast, girîng e.



Şaristaniya dewletdar, cudahiya kirdeyî û tiştên di pergalkirina wê de, risteke girîng dilîzin û dubendiyên ku xwe dispêrin van cudahiyan, kûr dike. Demê, bi awayê dîrokeke razber digire dest, ev jî xizmeta desthilatiyên hene, dike. Lê hişmendiyeke dîrokê ya jineolojiyê, li şûna ku dîrokê weke berhema di ser kesan re deyne holê, civakan bi rastiya dem û cih re bigihîne hev, bingeh digire.

Dîroknivîsê Firesnsiz. Fernand Braudel (Fêrnan Birodîl),

dibêje: “civaknasî dîrokîkirin e, dîrok jî civaknasiyîkirin e.” Balê dikişîne ser şaşîtiyeke bingehîn a rêbaz û zanistê. Ev, di watenasiyê de, yek ji mercên sereke yê pêşketinê ye. Sûdeke din a vê rêbazê,. Balê dikişîne ku civakîkirina dîrokê, nêzîktirî rasiyê ye.

Dîroka şaristaniyê, di heman demê de, dîroka windakirin û windabûna jinê ye. Ev dîrok, dîroka kesayeta serdest a mêr e ku bi xweda û ebdên xwe, bi serwer û tebayên xwe, bi aborî, zanist û hunera xwe, xurt bûye. Her wiha, li ser navê civakê windakirin û windabûna jinê, ketinek û windakirineke mezin e.

## LI SER VÎ BINGEHÎ, JINEOLOJÎ:

Ji bo Rêbaza derbaskirina pergala kedxwariyê ya li derdora jinê pêş ketiye, berxwedan û seknên jinê yên di dîrokê de, derdixe holê. Desthilatî, di ser vê danehevê re xwe birêxistin û domdar dike.

## LI DIJÎ VAN, JINEOLOJÎ:

Lêgerîna li hemû nirxên hêzên ku şaristaniya demokratîk lis er wan berdewam dike, derdixe holê. Dîroka koletiya jinê nehatiye nivîsîn û dîroka azadiya wê jî li hêviya nivîsînê ye. Dîroka koletiya jinê, bêguman, di çanda Rojhilat Navîn de, veşartî ye. Ji ber vê sedemê, derketina wê jî dê li ser van axan pêk were. Lê aşkereye ku wê bi şêwaza mêr pêk neyê. Jineolojî, wê bibe gava derketineke bingehîn. Ji nû ve nivîsîna dîrokê, di çarçoveya jinê de, bingeh digire. Dîroka jinê, ne tenê dîrokeke di çarçoveya zayendê de ye, dîroka ked, hilberîn, kolektîvîzm, civakîbûnê, di kêliyê de rêzgirtina ji raboriyê re û herikandina ber bi siberojê ve, ya bêdawî û bêserî ye, ne wateya ku dîrok niha, vedibêje.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima pêwîstî bi dîrokê heye?
2. Em di demeke çawa de dijîn? Binirxîne.
3. Dîroka koletiya jinê, li ku derê veşartî ye?

WANE 6

# TENDURISTÎ

Tenduristkara destpêkê ya ku dîrokê tomar kiriye, Nînhursag e û nexweşê destpêkê jî Enkî ye. Ya rastî, Nînhursag di efsaneyê de bi nifrînên xwe nexweşiyê dide Enkî, hem jî xweda dikevin navberê û pê bawer dikin, cardin wî baş dike. Hin ji taybetiyên Nînhursagê, xanima cihên kovî yên weke çol û çiyayan, xwedawendeke daran e ku têkiliya wê ji nêz ve bi maran re heye, hatiye dîtin. Xwedawenda ku hêzên wê yên weke: zayîn, saxkirin û nemirinê hene. Ev helwesta wê, rewşeke hevgirtî û pir balkêş e ku têkiliya Nînhursagê, ji nêz ve bi maran re heye. Ji ber ku ew mar, di hezar salên piştre de li asayekê (darekî, gopalekî) pêçayî, wê bibûya sembola tenduristî û bijîşkiyê. Wê bihata bîra hin kesan ku halê destpêkê yê wê asayê, dara kozmîk a Nînhursagê ye û marê ku tê de dijî, temsîl dike. Wê bihata bîra hin kesan ku destên ew asa afirandiye û digire, destên jinekê ne.

Nexweşî û dermankirin jî, ji qadên zanyariya xwedawenda dayîk bûn. Di demên xwedawendiyê de gelek xwedawend, di heman demê de bijîşk bûn. Mîna: Înanna, Îştar, Gula Baû (Nînîsînna), Kîbele, Helen, Demeter, li Misirê Îsîs û Sekhmet, Hekate, Leto, Persenophe, Medea, Kîrke. Di Zerdeştiyê de Ameretat û Haurvatat. Bi demê re ev xwedawend, dibin keç, an jî hevjîna xwedayên bijîşkiyê. Mînak: Di efsaneya Yûnanî de xwedayê bijîşkiyê Asclepius (Askilyopewis) e, keçên wî, Panacea (Panasiya) xwedawenda saxkirina laş bi giştî ye, Hygieia (Hiyegiya)



GULA BAU

û hevjîna wî Epione (Epiyone) xwedawenda sekinandina êşê ye, şîfakar in jî. Bi demê re hebûna jinan a di qadên tenduristiyê de, bi tevahî hat qedandin. Bijîşkî, bû zanista herî pir mandelekirin, ji nêz ve li ked û hebûna jinê tê kirin. Di roja me de jî di pirtûkên dîroka bijîşkiyê de nav, hebûn û keda jinê pir nayê bibîranîn. Bi taybetî, qet nayê ziman ku yên bingeha vî karî avêtine, ew in. Tevgerên tenduristiya jinê yên di salên dawî de bi pêş ketine, zêdebûna hejmara jinên di qada tenduristiyê de dixebitin û zanabûna ku jinê wergirtiye, di rakirina vê hişmendiya mandeleker de pir girîng in.




**Hygieia xwedawenda paqijiyê û tenduristiya can û hiş e, sembola wê mar û tasek av e**

Jineolojî, weke zanisteke hişmendiyê ya têkoşîna li dijî biçûkdîtin û mandeleya li ser hebûna jinê, bingeh digire. Vê keda tevgera tenduristiyê ya jinê dibîne û hevbeşbûnê dike armanc. Nerîna pozîtîvîst a Rojava mandele dike û Grek wek navend digre dest, rexne dike. Daneyên şûnwarnasiyê yên ku xwedawendên saxker ên destpêkê yên qada tenduristiyê, xweda, reçeteyên tenduristiyê, derman, dermankirina bi şînatiyan û hekîmtiya li Rojhilata Navîn dest pê kirine, diçespîne, bingeh digire. Ji ber vê sedemê, çavkaniyên Rojhilata Navîn lêkolîn dike. Ji bo ku jin ji nû ve bibin destên saxkirinê tê dikoşe.

Rêgeza bingehîn a vê têkoşînê, xwe dispêre vê: Civaka ku nikaribe tenduristiya xwe bi destên xwe biparêze, bingeh, hebûn û azadiya wê yan di bin gefê de ye, yan jî bi tevahî hatiye windakirin. Avakirina saziyên xwe yên tenduristiyê û pisporên wê, divê weke maf û erkekî bingehîn were dîtin. Desthilatî û dewlet, vî erkî ji destên wê bigire û yekdestiyê bike, ev dibe derbeyeke ku li tenduristiya civakê hatiye xistin. Maf û têkoşîna tenduristiyê, hestyariya di mijara

rêzdariya xwe û azadiyê de ye.



**Qada tenduristiyê,** îro bûye qada civakan a ku divê xweparastinê bêtir bi pêş bixe. Ji aliyekî ve bi destên pergalê gelek nexweşî bizanabûn tên çêkirin û berbelavkirin. Piştre dermanên çareya van nexweşiyan tên hilberandin û tenduristiya me dikin metayeke bazarê. Nexweş dikin, muşterî (zibûn), xizmeta tenduristiyê jî dikin bazirganiya ku xizmeta tenduristiyê dike.

**Qada tenduristiyê,** dike sektoreke xizmetên bênavber buhayê wan pir dibin. Li gelek deverên cîhanê, mirov bi pergala tenduristiyê bi hêzên dewletperest û desthilatperest, tên girêdan. Eger em îro nikaribin tenduristiya xwe ji destên firmayên li gorî zagona sûda pir ya yekdestiyên sermiyandar rizgar bikin, hebûna me di bin xeteriyê de ye.

Jineolojî, weke zanista vê diyalektîkê di bingeha başî û başkirinê de, li gorî cewhera wê ya di destpêka dîroka civakî de, ji nû ve ava dike û wê qada tenduristiyê bigire dest. Wê saxkerên ku lênerîna jineolojiyê bipejirînin, xwedî bike. Rêxistinkirina akademiyên tenduristiyê armanc bigire. Bi qasî destûrdarên fakulteya bijîşkiyê, perwerdeyeke bi hişmendiya ku wê jin û mêrên saxker jî karibin perwerdeyê bidin, bi pêş dixe.

Bi tevgerên tenduristiyê yên ji deverên cuda yên cîhanê re ji bo pêşxistina hişmendiya rêxistinbûn û xebata hevbeş, kar dike. Rûniştandina divêtiyeke refleksa xweparastinê ya di qada tenduristiyê de, dike armanc.

Jineolojî, tenduristiyê weke qadeke xwe ya girîng dibîne û pêş dixe. Ji bo ciwanên ku di qada bijîşkiyê de perwerdeyê dibînin, divê bi lênerîna jineolojiyê dîroka bijîşkiyê jî fêr bibin, her dem li ber çavan digire. Materyalan amade dike û lêkolînkirinê didomîne. Pêwîste mirov li bijîşkiya xwezayî vegerin, ji ber ku metirsiyên wê tune ne.

Lê belê metirsiyên dermanên kîmyayî pir in, heya ku cihekî derman dikin cihên din xirab dikin.



## JI BO QADA TENDURISTIYÊ:

1. Dîroka tenduriatiyê bi çavê jinê were nivîsandin.
2. Berhemên bijîşkiya xwezayî kom bikin.
3. Bi rengekî etîk  nêzîkatiya bijîşkiyê saz bikin.
4. Tenduristiya civakî ew e: tenduristiya xwe ji nexweşiyan ava bikin û biparêzin.
5. Di qada tenduristiyê de mafê jinan were parastin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Tenduristkara destpêkê, kî ye?

2. Xwedawendên saxker, kî ne?

3. Qada tenduristiyê gihaştiye kîjan astê, binirxîne.

4. Jineolojî, di qada tenduristiyê de wê çi armanc bigire?

5. Weke girûpekê li ser çima heya niha ji bo hin nexweşiyan derman nehatine dîtin û dermanên heyî çima metirsiyên wan hene, lêkolîn bikin.

WANE 7

# PERWERDE





Jin, şagirta yekem a xwezayê ye, mamosteya destpêkê ya mirovan e. Hem mêr perwerde kir, hem jî zarokên xwe. Di rêya dirêj û zehmet a civakîbûnê de jinê tu carî ji bîr nekir ku şagirta xwezayê ye, mamoste û dayîka civakê ye. Vê jî, **ew dikir hem a fêr dibe, hem a fêr dike**. Heman weke dayîka xwezayê, di navbera zarokên xwe de cudahî nedikir. Jinan jî, zarokên ku dianîn, hevbeş mezin dikirin, yek, dayîka hemûyan bû.

Jinê, bi hezarên salan fêr kir û hîn kir. Ew bi xwe fêr bû, xwe perwerde kir. Gelek zanistên ku civakîbûnê bidin jiyankirin, wisa kifş kirin. Civaka sincî û ramyarî, wisa li derdora xwe bi pêş xist. Dibe ku bi sehekiya ji xwezayê wergirtiye, jinê dizanîbû ku divê perwerdekirina zarokên xwe ji kesî re nehêle. Ji ber vê yekê, di civaka xwezayî ya ku dayîka xwedawend lê serwer e, perwerde, yek ji xebatên

bingehîn ên jinê bû. Jinê, ne tenê zarok, hemû civak perwerde dikir. Civakê, fêrbûna ji jinê, nedikir mijara desthilatdariyê.

Di bin çewisandin û êrîşên gelek yên saziyên hizira baviksalariyê de cihê jinê yê di perwerdekirina zarok û civakê de hat guhertin. Êdî Mafê perwerdekirina zarokan, ji jina dayîk bû ya saziyên perwerdeyê yên ku hatibûn avakirin. Bi demê re ket rewşeke ku her tiştê di perwerdeyên fermî de cih nedigirtin, wê weke zirbawerî (xurafe) bihatina nasandin. Zarok, di serî de zarokên kurik, wê destpêkê ji venêrîna dayîkê û piştre ji venêrîna civakê, biketana bin venêrîna hêzên dewletperest û desthilatperest.

Di tevahiya dîroka şaristaniya civakê de bi amûra perwerdeyê ya dewlet û desthilatiyê, mirov dikare bi aramî diyar bike ku di şerêli hemberî xwe dida meşandin de, bêhtir derbe xwariye. Mafê perwerdeya civakan, mafên herî zor ên tên pêkanîn in. Dewletê ev mafê pêkanîna wê ya her zehmet, desteserkiriye. Bi hezarên salan ji temenê destpêkirina dibistana seretayî, heta pergala perwerdeyê, wê çawa rabin û rûnên, dewlet bi darê zorê bi zarokan dide hînkirin. Ya rastî, em di rewşa nûjen a efsaneya Kawa de ne. Lê rojê, ne du ciwan, bi milyonan ciwan ji vê pergala perwerdeya cinawirî re tê dayîn. Hişên ku bi hişkebaweriyan (dogmayan) ve diqerisin, tên avakirin û hişên vekirî yên mejiyan tên tunekirin. Pergala perwerde û dibistanê ya ku mafê perwerde û mamostetiyê bi darê zorê ji jinê standiye û ava kiriye, îro li ber deriyê tune bûnê ye.



Dibistanên taybet ku li ser navê vebijarka vê derketin, mafê perwerdeyê ku yek ji mafên herî pîroz ê mirov e, bi perestandinê kirine rewşa metayê, qezenckirin weke armanca destpêkê pejirandin. Pergala perwerdeya fermî û dibistanê bi yekdestiyê afirandin, zanîna li derveyî dibistanên fermî, perwerde û mamoste rewa nabînin. Lê bi hezarên salan bi taybetî li Rojhilata Navîn, terîqet, dergah, xelwextxane (manastir), tekkî, medrese û hwd, bûne cihê dibistanan. Ev qas ceribandin û daneheva perwerdeyê ya civakê tune hesibandin, bi bîrdoziya desthilatperest ve girêdayî ye. Desthilatî, pergala perwerdeyeke ku karibe xwe berdewam bike, rewa dibîne û dimeşîne. Tam jî di vê kêliya herî zor de divê hişmendiya perwerdeya jinê, daneheva dewlemenda di têkiliya mamoste û xwendekar de bi rola xwe rabe. Mafê herî bingehîn ê hebûna civakê, mafê perwerdeya ji nû ve li ser navê civakê qezenc bike.

Pêwîstiya civakê bi dilnizmiya jinê ya di perwerdeyê de û jîrekiya wê ya hestiyar heye. Girtina Perwerdeya civakê ser milên xwe, dil û hezkirineke mezin dixwaze. Dibe ku ji ber vê yekê ye koka têgeha "perwerde" ji "Perwer" a hem di kurdî de hem di farisî de bi wateya "xwedîkirin, parastin û hezkirinê" ye. Tê wateya per-bask Wer-bibaskbûn, bi wateya ketina bin baskan e. Ya rastî, perwerdekirina mirovekî, ew bi bask-kirin, her wiha, wateya bifirê xistinê jî dide.

Jina dayîk, bi hezarên salan hemû mirovahî weke zarokên xwe xwedî kiri, parast, hez kir û girt bin baskên xwe. Weke çivîkên ku çêlikên xwe yên hîn bi bask nebûne, fêrî firînê dikin, mirovahî fêrî bibaskbûn û firînê kir.

## ARMANCA JINEOLOJIYÊ

Jîndarkirina têgeha "perwerdeyê" ye ku wê li gorî wateya dîrok û cewhera xebata perwerdeyê rave dike. Ango di serî de zarok û ciwan, ji pergala perwerdeya cinawirî ya nûjentiya sermiyandar

parastin, bi hezkirinê perwerde kirin, bi nirxên civakî û felsefeya azadiyê xwedî kirine. Ev, hemû girtina civakê ya bin baskên xwezaya bidad a jinê ye. Bi perwerdekirinê, bi baskkirin û firandin e.

Pirsgirêka perwerdeyê, çawa ku di cewher de saziyên sincî û polîtîk ên civakê pêwîst dike, pêkanîna erka sinc û polîtîkayê jî bingeha perwerdeya civakî ye. Civaka xwe perwerde neke, wê derfeta wê ya sinca xwe ya cewherî û saziyên polîtîk bi pêş bixe û li ser piyan bihêle ji holê rabe. Nikare her dem di bin xeteriyê de bijî, rizîbûn û belavbûnê rizgar bike. Jineolojî, ji bo ku vê guherîn û veguherînê biafirîne, divê bi hişmendiyeke perwerdeyê ya her qada xwe ya xweser û yek jî bi qadên din re, di nava girêdanekê de xwe bi pêş bixe.

## RÊBAZÊN JINEOLOJIYÊ

Di qada perwerdeyê ya ku wê di çarçoveya jineolojiyê de bi pêş bikeve, mijareke girîng jî cihên perwerdeyê ne. Cih, di serkeftina perwerdeyê de hêmaneke girîng e. Ji bo derbaskirina pergalên perwerdeyê, rêbazekê pêş bixe. Li ser vê rêbazê, her civak li gorî xwezaya xwe, pêwîstî û mercên xwe yên xweser saziyên xwe yên perwerdeyê ava dike. Dibistan û akademiyên li ser vê bingehê birêxistin dike. Jineolojî, di dîroka pergalên perwerdeya xwe de vebijarkan û ceribandinên cuda yên ku di dîroka jinê di tarîtiyê de hatine hiştin, lêkolîn dike. Dema ku pergala xwe ya perwerdeyê ava dike, nirx û wateya ji van ceribandinan derxistiye, wê li sazîbûn û hişmendiya wê, li rêbaz û amûrên wê zêde bike. Mijarên weke: xebitîn, bername, têkiliyên mamoste û xwendekar, tevlîbûna beşên cuda yên civakê, wê bi bingehên demokratîk ava bikin. Ji bo ku ev pergala perwerdeyê teorîk nemîne, divê xebatên pratîk ên piralî bi pêş bixe.

Gereke di qada perwerdeyê de bi tu awayî ferq û cudahî di navbera her du zayendan de tune be, ji bo pêşerojeke rast were avakirin. Eger ev cudahî hebe wê civak seqet bibe. Di heman demê de pêwîste civak zarokên xwe perwerde bike, yanî xwe bi xwe perwerde bike.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Cihê jinê yê di qada perwerdeyê de binirxîne.

2. Encamên saziyên hizra baviksalariyê yên li ser jin û civakê, binirxîne.

3. Dewletê, mafê perwerdeyê xistiye kîjan rewşê?

4. Koka têgeha perwerdeyê, ji ku hatiye?

# POLÎTÎKA

Peyva polîtîk li Yûnan Dewlet Polîs e.

Li Ewropa Birêveberiya Bajar e.

Bi erebî siyaset ji sayîs hatiye ew jî perwerdekirina hesapan ne.

Polîtîka xwe rêxstinkirine, xwe bi xwe birêvebirin e. Di roja me de polîtîka şaş hetiye pênasekirin û tê birêvebirin. Ji bo ku polîtîka ku îro ji aliyê desthilatdaran ve tê meşandin. Li gorî berjewendiyên hişmendiya desthilatdarên di nava civakê de, li hemberî polîtîka reflêksên ku ji polîtîka acizin û dûr dikevin encama polîtîkaya vê hişmendiyê ye.

Eger erka sincê, karên jiyanî yên herî baş kirin be, erka polîtîkayê jî karên herî baş dîtin e. Mirov bala xwe bidiyê, hem aliyê sincî yê polîtîkayê heye. Karên baş dîtin, ne hêsan e. Pir baş naskirina karan, ango zanîn û zanistê, yek jî dîtin, ango lêkolînkirinê pêwîst dike. Dema ku têgeha baş jî tevlî vê dibe, sincê zanînê jî pêwîst dike. Weke tê dîtin, polîtîka hunereke pir zehmet e.

POLÎTÎKAYA RAST, di pênaseya wê de veşartî ye: Berjewendiyên jiyanî yên civakê, ji bilî azadî, wekhevî û demokrasiyê tu koma têgehan nikare rave bike. Wisa be polîtîka bi bingehîn, civaka sincî û polîtîk, di her şert û mercî de ji bo vê wesfa xwe, yan jî hebûna xwe berdewam bike, çalaksaziya azadî, wekhevî û demokratîkbûnê ye.

Jineolojî, jina dayîk a hêza sereke ya civakîbûnê ye, weke afirînera hunera polîtîkayê digire dest û wisa dest bi lêkolîn û vekolînên xwe yên di vê qadê de dike ku bi deh hezarên salan karên baş ên ku civakê bidin jiyankirin, vedîtinee û pêk aniye, ew bû!

Jineolojî, bi armanca xwe ya bibe zanisteke civakî ya nû, aboriyê, ekolojiyê, demografyayê, etîk û estetîkê, tenduristiyê, perwerde û dîrokê digire çarçoveya xwe û pêş dikeve, ta zanista polîtîkayê

pêşnexe, nikare bi ser bikeve. Ji ber ku di tevahiya van qadan de karên baş ên ku wê bike, divê diyar bike. Ango der barê van qadên zanista civakî de pêwîst e polîtîkayê pêş bixe.

Di qada aboriyê de pêwîstiyên bingehîn ên civakê çi ne?

Çawa tên bicihanîn?

Ji bo ku ev werin bicihanîn, karên baş ên divê werin kirin, çi ne?

Di qada tenduristî û perwerdeyê de karên baştirîn ku wê pêwîstiyên civakî bi cih bînin, çi ne?

Weke vê, di hemû qadên ku dikevin çarçoveya jineolojiyê de, jineolojî van pirsan, bi nerîna azadîxwaz û bêyî ku ji rêgezên sincî yên bingehîn qut bibe, divê bi zanistî ji nîqaşê re veke. Weke zanista civakî ya ku wê zanista polîtîkayê xwe bispêrê, divê xwe vesaz û ava bike.

Li hemû cîhanê, bi giranî jin û ciwanên ku ji polîtîkayê hez nakin, ta bi nefret nêz dibin, ji ber ku polîtîka ji erka xwe û wateya xwe hatiye dûrxistin, bi vê ve girêdayî ye. Di bingeh û cewhera xwe de jî bi muxatabên bingehîn ên polîtîkayê, ango bi beşên civakî re benên wan qut dikin, bi vê ve girêdayî ye. Her ku jin û ciwan, ango hêzên herî dînamîk û azadîxwaz ên civakê, xwe ji polîtîkayê dûr bigirin, biryar û mekanîzmayên boçûna jiyana civakî diyar dikin, bi berdewamî di yekdestiya şaristaniya dewletperest û desthilatperest de dimînin.

Ji bo polîtîkayê, mirov dikare bêje, civak xwe bi xwe bi rê ve bibe jî têgeheke ku bi azadiyê re bi têkiliyeke zeximtir bi pêş dikeve. Civak xwe zanibe, nas bike, pênase bike û dest bi çalakgeriya der barê xwe de bike.

Polîtîka civakeke ku rojane ji pirsgirêkên xwe re sincê bingeh bigire û di rewşeke lêgerîna çareyê de be, em dikarin bêjin, sînordarkirina diyardeyên herikîna azadîxwaz a xwezayî ya jiyanê ye,

jiholêrakirin, yan jî guhertin, yên vê herikînê xurt dikin, mezinkirina vîn û çalakiya berfirehkirina wan e.

Jineolojî, pênaseyên polîtîkayê yên di qonaxên cuda yên dîroka civakî de hatine bipêşxistin, lêkolîn dike. Hem di wateya giştî de civak çawa li derveyî polîtîkayê ku weke çalakiya xwe ya cewherî ye hatiye hiştin, hem jî jinan ev pêvajo çawa jiyane, wê lêkolîn bike. Polîtîka, rastiyeke civakan a jiyanî ye, wê tu carî dest jê bernedin. Wê argumanên vê yên ku karibin têkoşîna paradîgmatîk û zanistî bidin, bi pêş bixe.

Di dîroka civakî de wateya polîtîkayê çi bû?
Çawa hat jiyankirin?
Xwezaya civakî, di bingeha xwe de sincî û polîtîk, çi ye?

Jineolojî, wê têgihîştina polîtîkayê ya ku hemû beşên civakî bi rengên xwe ve tê de cih bigirin û takekes bi vîna xwe ve beşdar bibin, pêk bîne. Wê der barê polîtîkayê de gelek pirsên din jî bike. Di asta zanistî û akademiyê de bersivan bi pêş bixe. Ji aliyê rêgezên destpêkê ve jineolojî, wê bi zanîna ku polîtîka bi şêwazeke bêcivak, nikare çêbibe, nêz bibe.

Eger polîtîka, ji bo civakê ya baş, rast û xweşik afirandin be, baştirîn civak bi xwe wê vê zanibe. Ta ku hişmendiya polîtîkayê ya xwe dispêre dewletperestiyê, hînbûnên ku polîtîkayê weke amûreke xapandin û çewisandinê tên bikaranîn, neyê hilweşandin, wê civak her tim li derveyî polîtîkayê bimîne. Ji bo ku ev neyê jiyankirin, civak û kes divê cîhana xwe ya hişmendiyê pir xurt amade bikin.

## ERKA JINEOLOJIYÊ JÎ

Di vê derê de derdikeve holê, ku erka wê, civak û kes, di asta hişmendiyê de ji qada polîtîkayê re amad bike.

DI ENCAMÊ DE JINEOLOJÎ

Zanisteke ku ji bo armanca jiyana azad, civak û kesa/ê azad pêk bîne, pêş dikeve. Aşkeraye ku azadî jî heta nebe xwedî polîtîkayeke rast, nikare bi pêş bikeve.

Mirov, polîtîkaya civakî biafirîne û pêk bîne, ev wê bibe jehrkuja takekesiyê û nûjentiya sermiyandar a ku qirkirina civakê pêk tîne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Erka polîtîkayê, çi ye?
2. Pênaseya rast a polîtîkayê, çi ye?
3. Jineolojî, çawa di qada polîtîkayê de lêkolînan dike?
4. Qadên ku jineolojî digire nav çarçoveya xwe û bi pêş dixe, çi ne?
5. Erka jineolojiyê ya di qada polîtîkayê de, çi ye?

| FERHENGOK | |
|---|---|
| Amator | Ne pispor, kesê ku karekî ne ji bo pereyan, ji bo zewqê dike, lê tê de ne profesyonel e. |
| Anket | Rapirsîn, jêpirsîna gelemperî ya ji bo diyarkirina nêrîna wan a li ser mijarekê. |
| Armonîk | Aheng, li hev hatin, ne dijberî hev bûyîn. |
| Aso | Ufuq, cihê ku mirov dibêje qey erd û asîman lê digihêjin hev. |
| Dara kozmîk | Dara bereketê ya ku bi heft çiqilî, heft gerestêrkan dinimîne, ev heft gerestêrk weke heft qatên asîman dinimîne. |
| Derasayî | Ne asayî, ne normal, gelek ji normaliyê cuda yan dûr e. |
| Diyalektîk | Rêbaza birêvebirina hiş a ku bi kêrî lêkolînkirina rastiyan û nakokiyên wan tê, her wiha rêyên derbaskirina van nakokiyan digere. |
| Ekolojî | Zanista hawirdorê, zanista ku lêkolînê li ser têkiliyên di navbera zindiyan, her wiha xweza û zindiyan de dike. |
| Emperyalîst | Mêtinkar, kes an jî pergala ku bi darê zorê cih an jî gelekî dagir dike û xwe berbelav dike. |
| Empozekirin | Sepandin, bi darê zorê dana pejirandin. |
| Fakulte | Beşên zanîngehê (Fakulteya Perwerdeyê) |
| Gen | Yekeyên biyolojî di DNA'ya jîndaran de ji bo diyarkirina taybetiyên wan ên ku ji dê û bav tên wergirtin. |
| Gerestêrk | Navê hevbeş ê cisimên asîmanî yên ku li derdora rokê dizîvirin. |
| Hewesdar | Dilxwaz, kesê ku dixwaze tiştekî bike, kesê ku ne bêdilî, yan jî neçarî tiştekî dike. |

| | |
|---|---|
| Kozmetîk | Her cure heybera bibêhn ku dibe sedem rû û por xweşik bibin û zindî bimînin. |
| Lîberal | Felsefeyeke ramyarî ye. Li ser bingehê wekheviyê tevdigere. |
| Mahrem | Ên ku mehra wan li hev nabe. |
| Marjînal | Tişta ku li derveyî civakê cih digire, biçûk, ne girîng. |
| Mekanîzma | Pergal, sazûmanî, yekbûna parçeyan a ku bi awayê têkel ji bo gihîştina armancekê hatiye çêkirin. |
| Milîtarîzm | Şerxwazî, baweriya ku divê welat bi rêya leşgerî were bi rê ve birin. |
| Mişextkirtin | Koçber kirin yan jî sirgûnkirin. |
| Motive | Parastin kirin. |
| Oryantalîst | Rojhilatzan, rojhilatnas. |
| Post-kolonyal | Piştî mêtîngeriyekê, welatê yan devera dagirkirî, welatê ku biyanî serdestê wê ne. |
| Potansiyel | Veşartî, tişta ku hebûn û hêza wê derneketiye holê. |
| Pozîtîvîzm | Diyardeyîtî, qonaxa felsefeyê ya Auguste Comte ku lêgerînên xwe dispêre diyarde, ceribandin û rastiyan, daxuyaniyên derî fîzîkî ji aliyê saziyî ve bêderfet û bêkêr dibîne. |
| Radîkal | Tundrew, bikok, misoger, ji binî ve. |
| Ramyarî | Siyaset, birêvebirina dewletê û dezgehên wê. |
| Sentez | Du tişt, an jî zêdetir ku gihîştin hev û tiştekî nû jê çêbû. |
| Sperm | Bizrik, toxmav, avika spî ya ku ji lebata zayendî ya mêr tê û pê jin ducanî dibe. |
| Vebijark | Alternatîf, bedîl. |
| Xanedan | Malmezin, kesê ji malbatek dewlemend, an jî navdar, endamê çîna jor a serdest. |

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Pêvajoya Sosyalîzmê | Rola jinê di şoreşên Emerîîkaya Latîn de |
| Cotmeh | Lêgerîna azadiyê ya Hay Gîn | Jinên Kurdistanî-1 | Jinên Kurdistanî-1 | Jinên Kurdistanî-2 |
| Mijdar | Jinên Kurdistanî-2 | Rast avakirina jiyan azad | Rast avakirina jiyan azad | Hevjiyana Azad-2 |
| Berfanbar | Hevjiyana azad-2 | Avakirina ronakbûna jinê | Şoreşa di zanistên civakî de | Rêxistina rêbazên lêkolîneke li gorî rastiya jinê |
| Rêbendan | Serhildana mîtingeha herî kevin | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | Girîngiya parastina cewherî ji bo jinê | Jin ta dawiyê heyîneke nirxdare | Etîk û estetîk | Etîk û estetîk |
| Avdar | Aborî | Aborî | Demografya | Demografya |
| Cotan | Ekolojî | Dîrok | Tendurstî | Perwerde |
| Gulan | Polîtîka | NIRXANDIN | | |